## SERETAYÎ

# ZIMANÊ KURDÎ 3

**Ev pirtûk ji aliyê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Rojavayê Kurdistanê ve wekî pirtûka waneyê hatiye pejirandin.**

## AMADEKARÊN PIRTÛKÊ

### Komîsyona Nûkirina Pirtûkan a Dawî

***Zozan CİZÎRÎ, Dîlan QASİM, Kurdistan ZÊWKÎ, Mizgîn GABARÎ, Şadin XELÎL, Dorşîn AKÎF, Dîcle DİRBÊSİYÊ, Mihemed ELÎ (CANO), Erdal LOLAN, Hejar ŞEKİR, M. Hisên HÎLALÎ, Egîd SADÛN, Mîtan ŞEPAL û Bedran PENABER***

### Komîsyona Amadekar a Berê

**M. Elî DEMÎR, M. Şîrîn ÇETÎN, Mazlûm TEKÎN, Îsmet YALVAÇ, Hawar GUNGEN, Sedîq BENEK, Selamet ERDOGAN, Emîne BULUT, Hesin DEMÎR, Sofî SÎDAR, Mihemed KARA, Mizgîn EGÎD, Arşek BARAVÎ, Birahîm XELÎL, Laleş FARQÎNÎ, Dijwar BOTAN, Ednan HESEN, Mustafa OSMAN, Hisên CİZÎRÎ, Bahoz BARAN, Muazez FİLÎZ, Cengîz KARA, Bedredîn OY, Merwan YAMAN**

*Çapa Yekem: 1999*
*Çapa Duyem: 2013*
*Çapa Sêyem: 2015*

# NAVEROK


**BEŞA 1 .......... 7**

AZAD Û DIBISTAN .......... 7
SIRÛDA ALFABÊ .......... 9
ZAROKÊ XEMSAR .......... 12
*MIJARA SERBEST* .......... 15
EZ KEÇEKE BIÇÛK IM .......... 15
MORIYA BIÇÛK .......... 16
JIYAN .......... 18
WATEYA HELBESTÊ BI KURMANCIYA JORÎN. .......... 19
EZ PIRTÛK IM .......... 20
PIRTÛK .......... 22
*MIJARA SERBEST* .......... *24*
PÊKENOK .......... 24
TEST 1 .......... 26

**BEŞA 2 .......... 27**

TEMAŞEKIRINA TELEVÎZYONÊ .......... 27
HEVALBENDÎ ÇIQAS XWEŞ E .......... 29
*MIJARA SERBEST* .......... 30
EVA DUNYA .......... 30
RÛMETÊN ME .......... 31
BOSTANÊ BAVÊ GÊJO .......... 34
RÊZDARIYA JI MAMOSTE RE .......... 35
EFRÎN .......... 38
PARASTINA XWEZAYÊ .......... 40
PERPEROK .......... 42
TEST 2 .......... 44

**BEŞA 3 .......... 45**

GURÊ ÇAVBIRÇÎ .......... 45
XALÊ MIN Ê COTKAR .......... 48
XEBAT Û KAR .......... 50
PENDÊN PÊŞIYAN .......... 51
NAME JI BO DAPÎRÊ .......... 52
BERF NABÊJE EZ TÊM .......... 55
KEWARA MÊŞAN .......... 58
HEŞTÊ ADARÊ .......... 61
TEST 3 .......... 63

**BEŞA 4 .......... 64**

DIRAVÊN AMADE .......... 64
ZAROK Û LÎSTOK .......... 66
NALÎNA KURDISTANÊ .......... 69
XWENDEKAREKÎ JÎR .......... 72

DARA GÛZÊ ........ 75
GULA DEVLIKEN ........ 77
ÎKLO DÎKLO ........ 80
ZAROK Û GUL ........ 81
BIHAR Û ENDÎWER ........ 83
ÇEND ŞÎRETÊN XANÎ ........ 86
VEGERA LEGLEGAN ........ 89
XECXECOK ........ 92
DAR ........ 93
TEST 4 ........ 95

**BEŞA 5 ........ 96**

MEHABAD ........ 96
XIFŞÊ ........ 98
ROVÎ Û GUR ........ 101
*MIJARA SERBEST* ........ 104
BILBILÊN DI RIKEHAN DE ........ 104
KULÎLK ........ 106
LEHÎ ........ 108
XWENDIN ........ 110
ALÎKARÊ COTKAR ........ 112
HEZKIRINA DAYÎKÊ ........ 115
KEW Û MIRÎŞK ........ 117
TEST 5 ........ 119

# BEŞA 1

## AZAD Û DIBISTAN

Azad serê sibê zû şiyar bû. Çû destşokê, dest û rûyê xwe şûştin. Taştê xwar. Diranên xwe firçe kirin. Cil û bergên xwe yên nû yên dibistanê li xwe kirin. Bi baldarî amûrên xwe yek bi yek di çentê xwe de bi cîh kirin. Xatir ji diya xwe xwest û berê xwe da dibistanê.

Azad pir bêriya dibistan, heval û mamosteyên xwe kiribû. Bi lez dimeşiya. Dixwest wan zû bibîne. Pir bi kelecan bû.

Dema ku ber bi dibistanê ve diçû, rastî hevala xwe Rojînê hat. Silav dan hev û bi hev re çûn dibistanê.

Hêdî hêdî baxçê dibistanê bi xwendekaran tijî bû. Hevalên xwe yên sala borî dîtin. Hevalên wî jî hemû wekî wî bi coş û kelecan bûn.

Piştî  wê bi lêdana zengil re xwendekar li hev civiyan û ketin rêzê. Di vê navberê de refên wan ên nû ji aliyê mamoste ve hatin diyarkirin. Paşê her kesek bi rêk û pêk kete refa xwe. Azad jî kete refa xwe ya nû. Piştî çend xulekan, mamoste hat refê.




Mamoste:

-Rojbaş zarokno! Sala nû ya hîndarî û perwerdeyê li we pîroz be. Ez bi dîtina we pir dilxweş im. Min bêriya we kiribû. Piştî axaftina mamoste, Azad û hevalên xwe li çepikan xistin. Rêzdarî û dilxweşiyên xwe pêşkêşî mamoste kirin.

## Wateyên Peyvan

**Perwerde:** Fêrdarî, têgihandin, xwedîkirin
**Kelecan:** Xiroş, peroş, heyecan
**Xwendekar:** kesê/a dixwîne
**Xule:** deqîqe

## Em Têbigihin

1-Azad ji bo çi sibê zû rabû?
2-Azad serê sibê rabû çi kir?
3-Bêhndana we ya havînê çawa derbas bû? Bi çend hevokan binivîsin.

## Hîndarî

Her yek ji peyvên li jêr di nav hevokekê de bi kar bînin.
Kelecan, Hîndarî, Perwerde

## Destûrên Ziman

1- Li ser her peyvek a li jêr hevakekê binivîsin :
Xwendekar – mamosta – dibistan – heval - azadî


## SIRÛDA ALFABÊ

Bijî bijî Kurdistan
Rê girtî, me biçûkan
Va em diçin dibistan
Ji bo hînbûna ziman

Zimanekî şîrîn e
Ciwan û hingivîn e
Abeya wê bixwîne
Sih û yek tîp bi cî ne

Heşt tîp hene şiyar in
Navê wana bideng in
Bîst û sisê xewar in
Tîpên girs û bêdeng in

Dibistana têkoşer
Hînbûna wana jiber
Kar û xwendin, zanewer
Mamostê me Dilawer




a-e- ê- i- î- o- u- û

b- c- ç- d- f- g- h- j- k- l- m-
n- p- q- r- s- ş- t- v- w- x- y- z

## Wateyên Peyvan

**Dilawer:** Mêrxas, dilovan
**Hînbûn:** Fêrbûn
**Têkoşer:** Xebatkarê dozê

## Em Têbigihin

1- Dibistan çi dide xwendekaran?
2- Zarok li dibistanê çi dixwînin?
3- Çend tîpên dengdêr û dengdar hene?

## Destûrên Ziman

***1- Di zimanê kurdî de 8 tîpên dengdêr hene.***
a- e- ê- i- î- o- u- û
***2- Di zimanê kurdî de 23 tîpên dengdar hene.***
b- c- ç- d- f- g- h- j- k- l- m- n- p- q- r- s- ş- t- v- w- x- y- z
***3- Ji rêzepeyvên li jêr kîjan hevok e?***
Rêgirtî
Va em diçin dibistanê.
Ciwan û hingivîn
-*Ji peyv û rêzepeyvên ku wateyeke tam diyar dikin re* ***hevok*** *tê gotin.*

Hevoka li jor di lênûsa xwe de binivîsin û li dawiya wê hêmaya xal ji bîr nekin.

## HÎNDARÎ

1- Dema mamoste helbest xwend, li ser van xalan baldar bin.
- Li kû derê kêm û li kû derê zêde radiweste?
- Dengê xwe li kû derê bilind û li kû derê nizim kir?

2- Helbestê bi awayekî bêdeng bixwînin, naveroka helbestê fêr bibin.

3- Helbestê bi awayekî rast û bideng bixwînin. Dengê xwe baş bipîvin.

4- Valahiyên li jêr dagirin.

.... girtî me biçûkan
Heşt tîp ....şiyar in
Bîst û sisê ..............

## Têbinî:

- Dema hûn dixwînin bila di navbera çavê we û pirtûkê de qasî 30 cm dûrbûn hebe. Ji bo tenduristiya çavê we, ev pir pêwîst e. Navê pirtûkên ku we di bêhndana havînê de xwendine, binivîsin.



# ZAROKÊ XEMSAR

Zarokekî xemsar hebû. Cilên ku ji xwe dikirin davêt erdê. Pirtûkên xwe li holê ji bîr dikirin. Li kû derê dilîst, pêlîstokên xwe li wir dihişt.

Rojekê, tiştên wî yên belawela, di navbera xwe de dipeyivin.

Gore:

- Tu çima heya niha li virî? Ma nedivê tu niha li dibistanê bûya?

Pirtûk:

- Belê. Mixabin zarokê xemsar dema ku çû dibistanê, ez li vir hiştim.

Cil û gore jî ji zarok bêzar bûbûn.

Şal:

- Binêrin hûn dizanin em ê çi bikin? Zarokê xemsar bilêta basê di berîka min de ji bîr kiriye. Em hemû bi hev re li basê siwar bin û ji vir biçin.

Tişt miştên wî, bi hev re dibêjin:

Erêêê!

Basa ku lê siwar bûn, ew birin gerangeheke şîn.

Li wê derê bi gog û veşartokê lîstin. Di nav axê de xwe gevizandin.

Ber bi êvarê ve dîsa li basê siwar bûn û zivirîn malê. Her yek çû cihê xwe.

Zarok ji dibistanê hat. Dema Rewşa tiştên xwe dît.

Got: Xwezî min ew rakiribûya da neketibûma vê rewşê.

Zarokê xemsar ji wê rojê şûn de cil, pirtûk û pêlîstokên xwe, li erdê nedihiştin.



## Wateyên Peyvan

**Xemsar:** sersar
**Bas:** Otobûs
**Gerangeh:** seyrangeh, park, Geştgeh
**Gevizandin:** Xwe di nava axê de gindirandin û qirêjkirin

## Em Têbigihin

1-Çi tişt ji zarok bêzar bûn?
2-Tişt miştên wî bi çi çûn gerê?
3-Qirêjî û belavbûna tiştan bandoreke çawa li zarok kir?

## Destûrên Ziman

1-Ji beşê (men) herî biçûka ziman a ku wateyekê radighîne re ***peyv*** *tê gotin.*

2-Di her hevokeke li jêr de çend peyv hene?

- ***Zarokekî xemsar hebû.***
- ***Tu çima heya niha li vir î?***
- ***Zarok ji dibistanê hat.***

3-Her yek ji peyvên li jêr di nava hevokekê de bi kar bînin?

*roj, gog, cil*

# HÎNDARÎ

❖ Mijarê destpêkê bêdeng, piştre jî bideng bixwînin.

❖ Di dema xwendinê de aram bin û rast rûnin.

❖ Hûn van xalên li jêr ber çavan digirin?

Pirtûk û lênûsên xwe berg bikin. Bi awayekî paqij bi kar bînin. Wan neqetînin û neqermiçînin. Pirtûkên xwe xêz nekin.

Heman baldariyê ji bo tiştên hevalên xwe û dibistanê jî nîşan bidin.

❖ Dema hûn dipeyivin hay ji van xalan hebin.

- ***Di destpêkê de baş bihizirin, paşê biaxivin.***
- ***Nêrînên xwe bi rêk û pêk bidin têgihandin.***
- ***Peyvên rast bêjin.***
- ***Hevokên kurt saz bikin.***
- ***Bi dengekî asayî bipeyvin.***



## MIJARA SERBEST

### AY LÊ GULÊ



Ay lê gulê gula minê
Şêrîna li ber dilê minê
Gulê nadim malê dinê
Wel ser gulê têm kuştinê

Gulê kesk û sor û zar e
Nîşana alê li sere
Êdî reng spî gewhere
Şêrîn û peymana minê

Rengê teyî pir delalî
Bilbil li ser te dinalî
Te nebînim di vî halî
Armanc û kesera minê

# MORIYA BIÇÛK

Moriya Biçûk sibê zû şiyar dibe. Dibîne ku hemû xwişk û birayên wê çûne. Ji xewê rabû û bêhnek stand. Rabû, çû dest û rûyê xwe şûşt.

Êdî ji bo destpêkirina jiyana xwe ya rojane amade bû. Wê rojê dibistan tune bû.

Ji ber vê yekê di morîstanê de bi tenê mabû. Piştî ku ji morîstanê derket, rastî moriyên diçin kar hat. Demekê wê li çûn û hatina moriyan temaşe kir. Piştre kete rê.

Pêşî berê xwe da gulistana ku moriyên biçûk lê dilîstin. Li wir bi xwişk û birayên xwe re lîst. Gelek şad bûn.

Piştre dest bi temaşekirina moriyên ku dixebitin kir. Di wê demê de moriyeke mezin bi awayekî devliken jê pirsî:

-Tu jî dixwazî bixebitî?

Moriya biçûk dikeve xiroşê.

-Belê.

Moriya mezin:

-Jixwe çûna dibistanê jî karekî girîng e. Lê dema dibistan ket betlanê, tu jî dikarî li gel me bixebitî.



Moriya Biçûk:

-Ez dixwazim li ser rûyê erdê bixebitim.

Moriya Mezin:

-Baş e. Her morî li gorî hêza xwe kar dike. Di jiyana moriyan de hevkarî heye.

Moriya Biçûk:

-Ez tê gihîştim.

Moriya Mezin:

-Dema tu mezin bibî, tu yê baştir tê bigihî.

## Wateyên Peyvan

**Morîstan:** Kunmêrî, cih û warê moriyan
**Hevkar:** Alîkar

## Em Têbigihin

1- Bûyera di mijarê de, li kû derê qewimiye?
2- Moriya biçûk berî ji malê der bikeve çi kir?
3- Moriyên biçûk di gulistanê de çi dikirin?
4- We ji vê çîrokê çi fêm kir?

## Destûrên Ziman

*Ji her sererêzekê re **bend** tê gotin.*
Di her bendekê de jimara hevok û xalan wekhev in.

## HÎNDARÎ

-Parvekirina karê malbata xwe diyar bikin. Bi çend hevokan binivîsin.
-Di nivîsandinê de ji çêlika moriyan re dibêjin moriya biçûk.
-Navên çêlikên tebayên jêr hîn bibin û binivîsin?
Mehîn, mih, bizin, çêlek, mirîşk, hirç, ker

## JIYAN



Min hezim le jiyane
Jiyan bew heze ciwane
Jiyan lay min xwêndine
Yariye pişûdane
Xebatêkî bê wêne
Encamekey wiçane
Min ew kesem xoşdewê
Bo xelkî bê ziyane
Destî mandûm xoş dewê
Xerîkî binyad nane
Karî be kelkim dewê
Nek karî fêkderane
Xwaye her awedan bê
Em xakey Kurdistane

***Rizgar Rastî***

## Wateyên Peyvan

**Bew:** Bi wî
**La:** Alî
**Pişûdan:** Bêhnvekirin
**Xoş dewê:** Jê hez dikim
**Binyadnan:** Bingeh danîn
**Têkderane:** Xirabkar
**Yarî:** Lîstin
**Rawestan:** Sekinîn
**Mandû:** Westan
**Kelk:** Sûd, mifa
**Xwaye:** Ey Xwedê

## WATEYA HELBESTÊ BI KURMANCIYA JORÎN

Min hezim le jiyane
***Ez ji jiyanê hez dikim***
Jiyan bew heze ciwane
***Jiyan bin wê hezkirinê xweşike***
Yariye pişûdane
***Lîstik e û bêhnvedan e***
Encamekey wiçane
***Encama wê rawestane***
Min ew kesem xoş dewê
***Ez ew kes im jê hez dikim***
Bo xelkî bê ziyane
***Ji bo xelkê bê zerere***
Destî mandûm xoş dewê
***Destê westiyayî min xweş divê***
Karî be kelkim dewê
***Min karên bi sûd divê***
Nek karî fêkderane
***Ne karê sextekaran***
Xwaye her awedan bê
***Xwedayo her ava be***
Em xakey Kurdistan
***Ev axa Kurdistanê***

# EZ PIRTÛK IM



Ez pirtûk im. Bi wêneyên rengîn dagirtî me. Her rûpeleke min bi agahî û zanistên cuda xemilandiye û çîrokên pir xweş jî di nav de hene. Her beyanî dema ez ji xew radibim bi dilkovanî radiwestim: "wê kî min bixwîne û zanînê ji min bigire." Ji bo min mayîna di nava refikên toz û gemarê yên pirtûkxanê de pir zor e...

-Gelo hûn dizanin, yên ku min bixwînin çi sûdî digrin? Deka guhdarî min bikin da ji we re hinek sûdên xwendinê bijmêrim:

-Agahiyên di derbarê çand, dîrok, wêje, xaknîgarî, zanist û hwd de fêr dibî.

-Heger hûn bixwazin civak û gelên din nas bikin, hûnê bi xwendina min bighêjin daxwaza xwe. Ji ber ku ez dost û hevalê we yê herî nêzîk û dilsoz im.

## Wateyên Peyvan

**Beyanî:** Sibeh
**Dilkovan:** Dilbixem
**Xaknîgarî:** Cografya
**Dilsoz:** Wefadar

## Em Têbigihin

1- Agahiyên di mijarê de kî radigihîne?
2- Pirtûk her beyanî bi dilkovanî li benda çi dimîne?
3- Gelo ji bilî pirtûkên dibistanê tu pirtûkan dixwînî, te çi sûd ji xwendina wan dîtiye?

## Destûrên Ziman

Sergotara vê mijarê ji çend peyvan pêk hatiye?
Ew bi tîpên mezin, an yên biçûk hatiye nivîsandin?
Di mijarê de çend bend hene?
*Ji sererêzekê heya sererêzek din re* ***bend*** *tê gotin.*
Her destpêkirina bendekê bi tîpa mezin tê nivîsandin.
Ji bo hejmara bendan bê dîtin sererêzan bijimêrin.

## HÎNDARÎ

Dema hûn dixwînin, van tiştan berçav bigirin:
-Bi goşê pel ê milê rastê bigirin û bi qulibînin.
-Pelan bi tiliyên şil nequlibînin û nequrmiçînin.

# PIRTÛK



Dosteke min a pir delal
Heye bêdest, pê û bal
Weke kesê ker û lal
Bêdeng rûdine li mal
Ne hawar û şer û qîr
Ne şivan e ne jî mîr
Ne xwarin dixwe ne cil
Tev pesnê wê ye ji dil
Lê ne ker e û gewc e
Her kes pê dibe hewce
Xwedî zimanekî şîrîn
Zana, zîrek û hiş in
Dema vala bûm ji kar
Diçim dîwana rêzdar
Bersiveke rast û dilnerm
Pêşkêş dike bi dilgerm
Heke we got ew çi ye?
Ew dostê zana kî ye?
Na ji we re nabêjim
Ma qey ez şaş û gêj im
Bipirsin ji bihîstok
Heke we dîte pirtûk

## Wateyên Peyvan

**Gewc:** Gêj, aqil sivik
**Bal:** Hişyarî
**Pesin:** Navtêdan, zirt

## Em Têbigihin

1- Di malika şeşê de kîjan pesin tên dayîn? Şîrove bikin.
2- Nivîskar di dema xwe ya vala de çi dike?

## Destûrên Ziman

Di helbestê de peyvên wekî "pirtûk, dîwan, dost" derbas dibin. Pêveka pirjimariyê li van peyvan zêde bikin û bikin pirjimar.

Peyvên li jêr lêkolîn bikin.

| | |
|---|---|
| Bersiv | bersivan |
| Şivan | şivanên |
| Mal | malan |
| Zana | zanayên |

## HÎNDARÎ

1- Li ser helbestê bixebitin, heya hûn jî weke mamoste xweş bixwînin. Piştre helbestê bi awayekî bi wate û dengekî bilind bixwînin.

2- Ji bo pîrozkirina Roja Mamosteyan, ji mamosteyên xwe re nameyeke pîrozbahiyê binivîsin.

## PÊKENOK

Dema ku Zîlan ji dibistanê zivirî, dayîka wê di pêjgehê de bû. Bi lez û bez çû cem dayîka xwe. Dayîka Zîlanê rewşa wê asayî nedît, lê tênegiha ku çi bi serê wê hatiye.

- Keça min xêr e! Tu ew qas bizdiyayî?

Zîlan:

- Îro! Dayê îro dema ku em ji dibistanê dizivirîn, yek ji trimpêlê ket. Her kes bi wê kenî, lê ez nekeniyam.

- Dayîk;

- Bijî keça min! Bi kesên ku tiştên wiha têne serê wan, kenîn şerm e. Gelo ya kû ji tirimpêlê ketî, kî bû?

Zîlan:

- Ez bûm dayê!



**NAVÊN ZINDIYAN DI XAÇPIRSÊ DE DIYAR BIKIN**


kîso

şêr

kêvroşk

mêş

sîvorî




| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| K | Î | S | O | W | İ | G | M |
| Ê | E | İ | H | E | D | E | Ê |
| V | O | V | A | N | Ê | R | Ş |
| R | A | O | Î | R | D | A | A |
| O | P | R | H | B | L | B | R |
| Ş | Ê | Î | Ê | J | C | Ê | E |
| K | R | T | Z | R | O | T | T |
| Ş | Ê | R | O | A | Y | Û | N |
| R | R | A | M | B | N | N | N |



## TEST 1



1-Valahiyên neqşeya têgehan bi tîpên degdêr temam bikin.




2- peyvan di stûna (A) bighîne wateya wan di stûna (B) de.

| A | B |
|---|---|
| Perwerde | Xebatkarê dozê |
| Têkoşer | Fêrdarî |
| Xemsar | Lîstin |
| Yarî | Sersar |

3- Bersiva rast helbijêre:

* **Ji beşê ziman ê herî biçûk û bi wate re çi tê gotin?**

a) nav b) peyv c) tîp

* **Nivîskarê helbesta "Ay lê gulê"ê kî ye?**

a) Hozan Goran b) M.Şêxo c) Aram Tîkram

* **"Xwendekar ronahiya pêşerojê ne " Li dawiya vê hevokê kîjan hêma tê bikaranîn?**

a) xalbêhnok b) sêxal c) xal

# BEŞA 2

## TEMAŞEKIRINA TELEVÎZYONÊ

Televîzyon amûreke raghandin, agahî û pêşandanê ye. Di televîzyonê de gelek rengên programan tên weşandin, weke nûçe, werzîş, mûzîk, fîlm û hwd... Ji bilî van, programên taybet ên ji bo zarokan jî hene ku zarok dikarin sûd jê bibînin, mîna: fîlmên karton û programên perwerdeyê yên zarokan ku fêrî danûstendin û kiryarên baş dikin.



Di televîzyonê de ji bilî programên erênî û baş, yên xirab ku bandoreke neyinî li pêşeroja zarokan dikin jî hene. Ji ber vê yekê, nabe zarok temaşeyî fîlmên tirs, şer û kuştinê têde heyî bike da ku ziyanê li deroniya wan neke.

Ji ber vê yekê pêwîst e em zarok bi zanebûn programên ku sûdê jê bigrin ji xwe re hilbijêrin û di wê hilbijartinê de pêwîst e em aliyên bi sûd yên temaşekirina televîzyonê hilbijêrin.

## Wateyên Peyvan

**Sûd: Fayde**
**Bandor: Tesîr**
**Ragihandin: Belavkirina agahiyan ( Press-Îlam)**
**Pêşandan: Nîşandan**
**Agahî: Haydarî, nûçe**
**Weşan: Belavkirin, werandin**

## Em Têbigihin

1-Hûn temaşeyî kîjan programên bisûd dikin?
2-Çi bandora programên neyênî li ser temaşevanan heye?

## Destûrên Ziman

Di hevoka "*Banî dikim heval**an***" de peyva "*heval**an***" navekî pirjimar e.

Dema em li ser "*heval*" pêveka "***an***"ê zêde dikin, navê yekjimar dibe pirjimar.

Navên li jêr ên yekjimar bikin pirjimar.

Zarok, mal, ciwan, dibistan

## HÎNDARÎ

1- Divê hûn kengî li televîzyonê temaşe bikin û kengî nekin? Şîrove bikin.

Dema hûn bersiva pirsa li jor didin, pêwîst e hûn li van xalan haydar bin:


- Tiştên ku hûn dixwazin temaşebikin, destpêkê baş bihizirin û piştre hilbijêrinin.
- Di rojê de, ji du demjimêran zêdetir temaşekirina televîzyonê bandoreke neyênî li çav û derûniya mirov dike.
- Nerînên dê, bav û mamosteyê xwe li ber çav re derbas bikin.

2- Pêwîst e di temaşekirinê de sê metran em dûrî televîzyonê bin.

# HEVALBENDÎ ÇIQAS XWEŞ E

Azad di refa sêyem de dixwend. Rojekê Azad li bexçeyê dibistanê dilîst. Ji nişka ve zarokek derket pêşberî wî û herdu li hev ketin. Azad li erdê ket û serê wî şikest. Serbest zû rahişt destê wî, destmala xwe ji berîka xwe derxist, danî ser birîna wî û ew bir odeya mamosteyan. Li wir mamosteyan birîna wî derman kir. Piştre Azad ken hindirê refa xwe û bi rêzdarî spasiya hevalê Serbest kir.

Ji wê rojê û şûn de Azad êdî hîn bêhtir ji Serbest hez dikir û wî jî her tim bi dilsozane alîkariya hevalên xwe dikir. Êdî ji wê bûyerê û pê de Azad bû xwendekarek nimûne di nava hevalên xwe de û heta ji bo alîkarîdana hevalên xwe carnan pêwîstiyên weke pênûs, jêbir û pênûsbir zêde bi xwe re tanîn ji bo ku bi hevalê xwe bide. Ji ber wê êdî ne tenê xwendekaran mamostayan jî, ji ber van kiryarên hevpar ji Azad hez dikir.



## MIJARA SERBEST

### EVA DUNYA



Eva dunya pir mezine
Têra me hemya heye
Çima çavê we bar nabe
Qey tenê dunya weye
Em jî kurdin wek însanan
mafê me jî lê heye



Ji nav baxê gula gulim
Hergulek bînek heye
Tev mirovin tev însanin
Her gelî rengek heye
Des bidin destê hevdû de
Kes ji kesî ne zêdeye
Mil bidin mile hevdû de
Salen xweş pêşya meye



Gazî dikim li dunyayê
Hun dizanin em kîne
Xwediyê dîroka kevnarin
Zerdeştî û medîne
Em rêberê mileta bûn
çima nave me nîne

## RÛMETÊN ME

Dema ku Hêlîn ji dibistanê hat, çavên xwe li dayika xwe gerand. Dayika wê li odeya xwe ya razanê rûniştibû û di destê wê de wêneyê xalê wê de hebû. Dengê dayika wê dihat, digot:

- serê min bi te bilind e.

Vê gotinê bala Hêlînê kişand, lê Hêlînê di çavên dayîka xwe de keser didît. Gazî xuşka û birayê xwe kir û li derdora dayika xwe rûniştin. Hêlînê ji dayika xwe re got:

-Dayê, min ji te fam kir ku şehîd mirovên gelekî bi nirxin.

Dayika wê li nava çavê wê nêrî destê xwe di pora wê de anî û lê vegerand :

- Keça min Mirovê ku tiştê xwe yê herî buha fedayî welat kiribin, ewê her wa pir bi nirx û pîroz bin.

Azad berê xwe da xuşka xwe û jê re got:

-Erê, Hêlîn, xuşka şehîd mirovên pir hêja ne. Kurdan di têkoşîna xwe de pir şehîd da ne. Van gotin bandor li ser Şîlan a ku heta wê çaxê bêdeng ma bû kir û hîn bêhtir nêzî dayika xwe bû û got :

-Dayê can şehîdan em parastine û niha jî ew me di parêzin?

Dayê bi dilekî tije hêvî bi aramî zarokên xwe nêzî xwe kirin destê xwe bi sere wan da anî û şîlan maç kir got:

-zarokên min ên delal, ez pir bi axaftinên we kêfxweş bûm. Xaka me pir mezine li ser her bostekî vê axê şehîdan xwîn rijandine. Li ber her kevirekî şer kirine û bi vî awayî ev xaka pîroz parastine. Ji ber wê divê tim nav û bîranîna wan li nav dil û mejiyê we be. Ji ber ku ew ronahiya jiyana me ne, ku ew nebin, ti wateya me tune ye.



## Wateyên Peyvan

**Rûmet** : Bi nirx-giranbuha
**Pakrewan** : Şehîd
**Rêbertî** : Serokatî
**Dîrok** : Mêjû, tarîx

## Em Têbigihin

1- Dayê Gulê û Rojhat li ser kîjan mijaran dipeyîvîn?
2- Bi kinhî pakrewanan-şehîdan pênase bikin?
3- Li gor mijarê pêwîst e li himber nirxên pakrewanan çawa tev bigerîn?

## Destûrên Ziman

1- Di hevokên li jêr de alavên binê wan hatî xêzkirin bi serê xwe wateyekê nadin. *Ji (û-ku-jî) van dengan re dibêjin* ***gihanek.***

Rêzan **û** Gulê bi hev re diçin dibistanê.
Pêwîst e hûn baş guhdarî bikin **ku** hûn têbigihin.
Ez gelek şa bûm ku em **jî** xwediyê van rûmetên herî mezin in.

2- Her yek ji peyvên li jêr di hevokekê de bikar bînin.
*Berxwedan, şehîd, ked*

## HÎNDARÎ

1-Nivîsandina we li jor xwendî bi çar-pênc hevokan şîrove bikin?
2-Ji bo pîrozkirina cejnên netewî, hûn di dibistanê de çi amadekariyan dikin?

## XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

**Tîpên Mezin**

A- B-C-Ç-D-E-Ê-F-G-H-I-Î-J-K-L-M-N-O-P-Q-R-S-Ş-T-U-Û-V-W-X-Y-Z.

**Tîpên Biçûk**

a- b- c- ç- d- e- ê- f- g- h- i- î- j- k- l- m- n- o- p- q- r- s- ş- t- u- û- v- w- x- y- z.



# BOSTANÊ BAVÊ GÊJO

Rojekê ji rojan bavê Gêjo nexweş bû, di nav nivînan de bû. Gazî Gêjo kir û got:' Lawo Gêjo here cem bijîşk û zû gazî wî bike, bila nesekine were.' Gêjo got: Çimaaa. Bavê wî got: Gêjo ma tu rewşa min nabîne. Tuyê here û jê re bibêje: Bavê min nexweşe û bê hale. Di nav livînan de ye. zikê wî werimiye bûye weke kundirekî. Pozê wî sorbûye bûye weke bacanekê. Serê wî nepixiye bûye weke zebeşekî. te fêm kir?

Gêjo serê xwe hejand û bi lez kete riya mala bijîşk û de di ber xwe de digot:' zebeş bacan kundir.' Dema bijîşk jêre derî vekir got: bijîşk, bijîşk, bavê min bavê min bûye weke bostanekî



# RÊZDARIYA JI MAMOSTE RE




Rojekê li Efrînê vekirina dibistanekê hebû. Rêveberiya dibistanê û mêvanên vexwendî, xwendekar û malbatên xwe amade bûn. Ji ber ku dibistana xwe vedikirin, hemû di nav kêfxweşiyeke mezin de bûn. Yekem car bi zimanê dayîkê wê dest bi perwerdê kiribana.

Dema ku mamostayekê ji bo axaftina vekirinê banî hevseroka meclîsa gel a Efrînê kir, xwendekarekê gulek pêşkêşî wê kir. Lê wê gul negirt û got:

-Yên ku şayanê vê gulê mamoste ne, ne ez im. Gulê bide mamosteyên birûmet. Ji ber ku Mamostetî karekî pîroz e, divê em li hemberî wan rêzdar bin.

## Wateyên Peyvan

**Rêzdarî:** Hurmetdayîn
**Vexwendin:** Daxwazkirin, dawetkirin
**Şayan:** Hêja, guncaw, stêle, layîq

## Em Têbigihin

1- Mamoste, xwendekar û malbatên xwe ji bo çi kom bûbûn?
2- Kêfxweşiya wan kesên amade ji bo çi bû?
3- Mamoste ji bo axaftinê bang li kê kir?

## Destûrên Ziman

1- Çima navên li jêr taybet in?
"Dêrik, Efrîn, Kobanê, Qamîşlo"
*Ji navên ku tenê ji bo heyînekê tên bikaranîn re **navên taybet** tê gotin.*
2- Tîpa destpêka navên taybet mezin tê nivîsîn.

## HÎNDARÎ

1- Destpêkê, mijarê ji mamosteyê xwe guhdarî bikin; piştre bê deng û bi deng bixwînin.

2- Dema hevalên we mijar xwendin, baş guhdarî bikin ka hevalên we mijarê rast dixwînin an na?

3-Ramana bingehîn a mijarê li lênûsa xwe binivîsin, di refê de ji hevalên xwe re bixwînin.

# XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

**Tîpên Mezin**

*A B C Ç D E Ê F G I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z*

**Tîpên Biçûk**

*a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z*



# EFRÎN

Piştî ku Lîlav û malbata xwe ji seyrana hefta ya Efrînê vegeriyan Dirbêsiyê, Lîlav gelekî kêfxweş bûbû. Ji ber wê yekê, hevalê wê Sîpan mereq kir û jê pirsî:

-sedemê vê kêfxweşbûna te ya zêde çi ye?

Lîlav berê xwe dide Sîpan û hinek din nêzî dibe û dibêjê:

-Ji ber ku ji berî heftiyekê ez û malbata xwe çûbûn Efrînê û me demekî pir xweş li wir derbas kir.

Dema ku Lîlavê wa got, Evînê pir mereq kir û ji Lîlavê xwest ku hinekî ji wan re qala Efrînê bike.

Lîlavê jî pir ji dil temaşiyî wan kir û got:

-Efrîn bajarekî rengîn ê Rojava ye. Weke bûkekê ye ku bi darên zeytûn, rûbar, kanî deşt û baniyan hatiye xemilandin. Ji ber wê jî avhewaya wê pir xweş û hênike. Dîsan li Efrînê gelek cîhên dîrokî jî hene, weke; Kela Semanê, Kelha Hûriyan û Êndara ku cîhek binav û denge û dîrokî ye. Dîsan sûlava Meydankê û Basûta ku cîhên pirxweşin û wek seyrangeh tên dîtin hene.

Di vê navberê de, dema ku Lîlavê behsa erdnîgarî, çiya û baniyên Efrînê dikir çavên wê dikenîn û te digot hez kirin ji rûyê wê dibare. Ji ber wê yekê Sîpan û Evîn pir ji gotinên wê bibandor bûn û biryardan ku sala were seyrana xwe ya salane li Efrînê derbas bikin.



## Wateyên Peyvan

**Avhewa**:Rewşa hewayê/şilî û zuhayî
**Sedem**: Sebeb
**Dîrok**: Tarîx-mêjû
**Sûlav**: Şelale
**Seyrangeh**: Cîhê ger û geştê

## Em Têbigihin

1- çima lîlavê gelekî kêfxweş bû?
2- Tu karîa pişîlê piranî çi ye?
3- Sûdê pişîlê ji bo me çi ye?

## Hîndarî

Hûn û hevalên xwe li ser taybetmendiyên Efrînê guftûgo bikin.
Li ser seyraneke xwe bi çend hevokan binivîse û ji hevalên xwe re raghîne.

# PARASTINA XWEZAYÊ

Parastina xwezayê parastina jiyanê ye. Ji ber wê divê em hemû her tim xwezayê weke canê xwe biparêzin. Ji ber ku xweza were gemar kirin wê netenê jiyana mirovan jiyana hemû zindiyan bikeve xeteriyê û roj bi roj wê nexweşî û mirin zêde bibin.

Em jî ji bo kêf û şadiyê bi malbateke nas re, bi keştiyê çûbûn geşta gola bajarê Wanê. Di wê navberêde dostê min ji berîka xwe pakêtek çeqûlat derxist, Piştî çeqûlat dan zarokan, kaxeza wê gelifand û avêt golê. Di wê navberê de zarokekê da ber qîran :

-Aaa! Hûn ê Golê qirêj bikin! Temaşe bikin li pêşberî we selika gemarê heye. Ji bo hûn gemara xwe bavêjinê, neavêjin golê.


Ez rojeke din bi hevalekî xwe re bi aliyê Xelatê re daketin Golê. Dema em bi keştiyê di nav golê de digeriyan derdor bi gemarê tije bû. Peravên golê ji ber gemarê nedihat dîtin. Ji ber wê yekê min banî berpirsyar kir:


- Ji bo çi hûn van deran paqij nakin?

Berpirs bersivek wisa da:

-Camêr, em van deran her tim paqij dikin, lê bênavber hin gelaş û gemara xwe davêjin golê. Ya zor ew e, em derfet bibînin ku xwe ji gemarê rizgar bikin.

Ji bo gol paqij bimîne, tê xwestin ku em ji her goşeyeke welatê xwe wek mala xwe hez bikin. Di rastiyê de divê welat malek hîn firehtir bê dîtin. Wê demê welat dê maleke paqij û malbateke bi rêkûpêk be.



## Wateyên Peyvan

**Xelat:** Navçeyeke girêdayî bajarê Bidlîsê ye.
**Gelaşdank:** Cihê gelaş, sepeta gemarê
**Gelifîn:** Qurmiçandin

## Em Têbigihin

1-Zarok çima qêriya?
2-Zarok xwest ew mirov çi bike?
3-Çima li Xelatê gol paqij nedikirin?

## Destûrên Ziman

Em rastnivîsa peyvê di nivîsandina mijarê de fêr bibin.

1-Ji peyvên ku li jêr ne wekhev hatine nivîsandin kîjan rast e? Hûn dikarin ji mijarê sûd bigirin.

Xelat-Xalat
Welat-Walet

2-Peyvên li jêr ji ber ku her yek ji wan giştiyekê diyar dikin jê re navên giştî tê gotin.

**Mînak:** peyva 'gol' dema tê gotin gelek gol tên bîra mirov.

**Gol** **Gelaş** **Zarok** **Keştî**

## HÎNDARÎ

1- Ji bo ku hûn bi dengekî xwezayî bixwînin, li cihê bêhnok, xal û nîşana pirsê li gor pêdiviyê rawestin.

2- *“Eger her kes derê mala xwe paqij bigire, tevayî welatê me wê paqij bimîne.”*

Vê gotina jor vekin. Girêdana vê ya bi mijarê ve bidin diyarkirin.

3- Çima pêwîst e ku em derdorê xwe paqij bigirin? Di refê de şîrove bikin.

# PERPEROK



*Perperoka evîndar*
*Xalên perên te jîndar*
*Li ser gulan digerî*
*Bi te dibim hêvîdar*

*Tu kes nebêjin kulî*
*Ew ê lingê wî stirî*
*Ev guleke difire*
*Xemla derdora min î*

Penaber

*Mijara bi navê perperok bi tîpên mezin û biçûk bi xemil li lênûsa xwe binivîsin.*



## TEST 2



*1 Bersivarast li jêr bi tîpa (R) ya şaş jî bi tîpa (Ş) nîşan bikin.*

A)**Navên taybet** ji navên ku tenê ji bo heyînekê tên bikaranîn. (   )
B)**Çiya** ji navên giştî ne. (   )
C)**Bihar**: Ji peyvên ku ji heyînekê zêdetir diyar dike. (   )
D)**Eyndara** ji cîhên dîrokî li Efrînê ye. (   )

***2- Bersıva rast li jêr hilbijêre:***

**1- Di kîjan hevokên li jêr de navê taybet heye?**
a) Bizin diçêrin. b) Firoke difirin c) Kerkûk bajarekî dîrokî ye.

**2-Ji rêze peyvên li jêr kîjan ne hevok e?**
a) Rojekê heval hatin. b) Me sêv xwarin. c) Sibe hûn.

**3-“Wateya berxwedan û kedê çi ye?” Di peyva destpêka vê hevokê de çend tîpên dengdêr hene?**
a) du b) çar c) sê

**4- Çima şehîd mirovin bi nirxin?**
a) Ji ber ku ji civaka me ne.
b) Ji ber ku ji bo welat canê xwe feda kirine.
c) Ji ber ku şer kirine.

***5-Ji bo çi pêwîst e em xwezayê bi parêzîn?***

a) Ji parastina jiyanê
b) Ji bo birkirina daran
c) Ji bo gemar kirina derdor.
ç) Ji bo germahiya derdor

# BEŞA 3

## GURÊ ÇAVBIRÇÎ

Dibên hebû nebû di demên pir kevin de, gurekî birçî û diran tûj hebû roviyekî fêlbaz digire û jê re dibêje:

- Zû ji min re hinek xwarin bibîne, yan ez ê te bixwim.

Li nêzîkî wan, mala cotkarekî hebû. Conegayek kuştibû û goştê wî li ser banî veşartibû. Rovî ev ji gur re diyar kir û got:

- Ger tu bixwazî, em dikarin bi hev re biçin bixwin.

Gur:

- Bila, hem di çûyîna malê de, hem jî piştî me goşt xwar, di revînê de tu yê alîkariya min bikî.

Herdû bi hev re ber bi mala cotkar birêketin û bêdeng hewaketin ser banî. Dema gur wî goştê zêde dibîne pir kêfa gur tê. Ji kêfan nedizanî çi bike. Rovî jî ji aliyekî ve goşt dixwe, ji aliyê din ve jî dibeze ber kulekê. Ji bo hêsanî bikare tê re bireve, dipîva.



Gur jê pirsî:

- Çima tu bi dilê xwe naxwî?

Rovî:

- Ez lê dinêrim ka kes tê yan na? Ez ji bo te jî pêşniyar dikim, zêde nexwe.

Gelek neçû, cotkar qirçqirçên di serban de bihîst û bezî. Dema rovî dengê lingê cotkar bihîst, di kuleka hatî re zû derket û çû. Gur jî xwest li pey wî biçe, lê ji ber ku ewqas goşt xwaribû zikê wî werimîbû û di kulekê de asê ma.

## Wateyên Peyvan

**Çavbirçî:** Têrnexwar
**Kulek:** pace
**Serban:** Banîje, serê xanî

## Em Têbigihin

1- Gur û Rovî ji bo zikê xwe têr bikin çûbûn ku derê?
2- Bi rêzê ve çi bi serê gur û rovî hat?
3- Gur û roviyê ku di vê çîrokê de cih digirin, taybetiyên wan çi ne?

## Destûrên Ziman

Hevoka li jêr li lênûsa xwe binivîsin.

*"Li nêzîkî wan, mala cotkarekî hebû."*

Di vê hevokê de peyva cotkar li peyva **"cot"** paşgira **"kar"** hatiye zêdekirin.

Têkiliya di navbera peyvên **"cot"** û **"cotkar"** de çi ye? Di refê de şîrove bikin.

2-***"Çima tu bi dilê xwe naxwî?"*** Çi hêma li dawiya vê hevokê hatiye danîn?

Li dawiya hevokên pirsyarî hêmaya pirsê (pirsnîşan) **(?)** tê danîn.

## HÎNDARÎ

1- Dema hûn mijarê dixwînin, peyvên hûn wateya wan nizanin diyar bikin. Ji bo têgihiştina wan peyvan, arîkarî ji hevoka tê de derbas dibe bigirin. Peyva we wateya wê nezanî, ji ferhenga Kurdî sûd bigirin û têbigihin.

2- Bêyî ku rêza bûyeran xira bikin çîrokê bibêjin. Piştre, bi çend hevokan li lênûsa xwe binivîsin. Dema hûn kurtiya çîrokê dinivîsin, destûrên nivîsînê, di cih de bi kar bînin.

2- Ramana bingehîn a we nivîsandî nîşanî mamosteyê xwe bikin.

***“Mirov dikare zikbirçiyan têr bike lê mirov nikare çavbirçiyan têr bike”***

*“Gotina Pêşiyan”*

# XALÊ MIN Ê COTKAR

Wê rojê, piştî ez ji dibistanê hatim, despêkê min cilên xwe yên dibistanê guhertin, dest û rûyên xwe baş bi sabûnê şûştin û paşê dayîka min gazî min kir “were firavînê bixwe canê min” bi gotina diya xwe re, ez ber bi pêjxanxeyê çûm. Ji ber ku me timî xwarin li pêjxaneyê dixwar. Dema min pel di sufrê de dîtin, pir kêfa min hat. Nizanim, pir birçî bûbûm an jî dayîka min pir xweş çêkirbûn. Min zikê xwe têr kir. Piştî ku min destxweşî li dayîka xwe da, wê bi gotina “ nûşîcan be, canê te pê ne êşe, kurê min” bersiva min da.

Xalê min cotkar bû; ew mirovekî pir hêja û têgihiştî bû. Ji xwe ji wî pê ve xalên min nebûn. Ji ber vê yekê dayika min ew tu caran ji xwarinên mala me bêpar nedihişt. Bi taybet dema xwarineke xwemalî (seredew, kutilk, şamborek, keledoş, pel, mehîr, serûpê...) çêkiriba xalê min li kû ba diviya jê re bişanda. Ji ber ku Kes li malê nebû piştî ku diya min navnîşana zeviya cot ji min re got, min beroş girte destê xwe û ez bi lez gihiştim ba xalê xwe. Di wê navberê de bi du gayan hîn cot dikir û di nava xwêdanê de mabû. Piştî ku min jê re got“Qewet be xalo“, bi destê xwe yê çepê xwêdana eniya xwe paqij kir û bi gotina“Tu sax bî xwarzîkê min, ka were te ji bo xalê xwe çi aniye“ bersiva min da.

Piştî ku xwarina xwe xwar min jê pirsî: Xalo, tu yê çi biçînî ?



Ji rûyê wî diyar bû bi pirsa min kêfxweş bû, destê xwe bi serê min de anî, kêmekî keniya û bi gotineka pêşiyan bersiva min da "Dema şîn bû, tu wê bibînî. " Paşê ez xistim himêza xwe û weha ji min re got: Xwarzîkê min, bila li bîra te be; ne tenê gundî, jiyana hemû bajar, welat û mirovan li ser çandinî û sewalvaniyê ye. Ger di welatekê de cotkarî û sewalvanî nepêşketî be tu caran ew walat xwe li ser piyan nagire û wê her dem li ber mineta welatên din be. Ji ber wê yekê dema te xwendina xwe qedand û bûyî karbidestek, divê tu ne tenê girîngî, rêzdariyeke pir mezin jî bidî keda cotkar û sewalvanan, baş e, xwarzîkê min ê delal..."

Ez bi van gotinên xalê xwe pir kêfxweş bûm. Min wê demê fam kir ku xalê min û cotkarên din ne tenê cotkar in; kedkarên gel û welatê xwe ne.

# XEBAT Û KAR

Bê xebat û kar û bizav
Bê zanîn û rijîm û rav
Navê xudanê heq û nav
Navê xudanê heq û nav

Eger bimîne sist û xav
Ev taristan nabe hetav
Peyda dibe jana zirav
Peyda dibe jana zirav

Pêşkevin xorto gav bi gav
Bi xebite ji dil û hinav
Şarebaze û hebe sed çav
Şarebaze û hebe sed çav *M. Şêxo*



# PENDÊN PÊŞIYAN

***Gotinên li jêr bixwînin.***

Mala pîrê xweştir e ji ya mîrê.

Rih dibe bost, dijmin nabe dost.

Ava hêdî hêdî, me ecêb jê dî.

Şeko şeko navê xwe li hevalê xweko.

Av çiqasî di golê de bimîne, genî dibe.



# NAME JI BO DAPÎRÊ

Dapîra min a hêja;

Ez dizanim, ji bo nivîsandina nameyê dereng mam. Min îro hejmart. Va ye sê meh in em ji hev dûr ketine. Min bibexşîne.

Em hemû li vê derê baş in. Waneyên min jî baş diborin. Birayê min jî fêrî xwendin û nivîsandinê dibe. Ji bo vê bi şev û roj dixebite.

Xweşiyên bêhndana ku min li gel we derbas kirî, ji bîr nakim. Dehla ku me bi hev re av dida, fêkiyên me ji çiqên wan kom dikirin, hîn jî li pêş çavên min in.

Dema Çavreş ji koxa xwe dûr dimîne dike orîn?

Çêja nivîşk û toya ku we çêdikir, tu car ji devê min naçe. Caniya me ya Reşbelek, careke din, teriya xwe radike û dibeze?

Dapîra min, ez li benda dîtina we me. Ji bo hatina li gel we bêhedar im. Min gelek bêriya we, bapîrê xwe û gund kiriye.

Ez, ji dayîk, bav û birayên xwe re silavên xwe yên ji dil û can dişînim. Ji bo we rojên bi tenduristî dixwazim.

Silav û hezkirin.

*(wajo)*
***Dilar HESRET***

Navnîşan:
Tiltemer

14-02-2002





## Wateyên Peyvan

**Canî:** Mehîna biçûk
**Çêj:** Tam
**Bexşandin:** Lêborîn
**Wajo:** Îmze, şanenav, destnîşan

## Em Têbigihin

1-Dilar, ji bo kê name nivîsiye?
2-Dilar, rojên li gund borandî çi ji bîr nekirine?
3-Dilar, di herdu bendên dawî yên nameya xwe de çi gotiye?
4-Dîrok û navnîşan, li kû dera nameyê hatiye nivîsîn? Wajo li kû derê hatiye avêtin?

## Destûrên Ziman

1-Navê çêlek û caniya di nameya Dilarê de derbas dibe çi cureyên navan e? Tîpên destpêka van navan, di nav hevokê de bi tîpên mezin hatine nivîsandin.


Wekî di nameyê de tê dîtin, navên taybet li lawiran jî tê dayîn. Ji wan navên taybet ên ji lawiran re hatî dayîn, ên hûn dizanin an jî yên hûn fêr bûne, li lênûsa xwe binivîsin.

2- Peyvên li jêr her yekê di nava hevokekê de bi kar bînin.

*“nivîşk, dapîr, bapîr”*

## HÎNDARÎ

1- Ji xizmeke xwe re nameyekê binivîsin.
Dema hûn nameyê dinivîsin van xalan ji bîr nekin.
Dîroka rojê, wajo û navnîşana xwe li cihê wan binivîsin.
Nameya xwe li ser peleke bêxêzik û bi pênûsa divît binivîsin.
Nivîsandina tiştên hûn dixwazin vekin, pirs bikin û ji bîr nekin.
Nameya xwe bi silav û hêviyên baş, bi dawî bikin.
2- Li ser zerfa li jêr, kîjan zanîn cih digirin, lêkolîn bikin û bibêjin.
3- Nameya xwe wekî mînakê binivîsin, bixin zerfê û rêbikin.
Tiştên hûn di wêneyên jêr de dibînin bi rêzê ve vekin.



# BERF NABÊJE EZ TÊM

Heta ku berf nebare û her derê di nava sar û serma ya xwe de neqerisîne, gelek ji me amadekariyan nakin û paşê gilî û gazindan ji barîna berfê dikin. Weke deste biratiya Hêştir û Berfa spî.

Dibêjin di demên kevin de Hêştir û Berf bûbûn destebirakên hev û Hêştir ji  Berfê re dibêje:

-ji kerema xwe re, beriya hatina xwe min agahdar bike, ku ez tedbîra xwe bigirim.

Berf dibêje:



- Wey ser seran, ser çavan destebira. Ez ê te agahahdar bikim. Rojekê berf li ser çiyayê bagokê bariya. Ji ber vê yekê tevê sewalan ji bo ewlekariya xwe, tedbîrên xwe girtin. Lê ne xema hêştirê bû û bawer dikir ku heta berf jê re nebêje"Ez têm", nayê. Ji ber wê jî, tu tedbîrên xwe negirtin û bi dilê xwe di hêşînahiya mêrgan de diçêriya. Di demeke kurt de berf barî û xwe gihand gund. Her der di binê berfê de ma.

Ji ber vê yekê Hêştir bi hêrs dibe û bang li berfê dike:

- Ka destebiratiya te? Te yê ez agahdar bikirama!?

  Berfê serê xwe hilanî bi dengekî bilind bersiva Hêştirê da û got:

- Qey tu kor bûyî destebirako? Dema ku ez daketim serê çiyê, min dar û ber tevda spî kirin, ma te ez nedîtim? Hîn çawa ji te re bêjim va hatim destebirako ?! Ma heta berf neyê ber derî tu bi xwe nahesî destebirakê min..!

## Wateyên Peyvan

**Peyker:** Pût, heykel
**Talge:** Gulat, guloka berfê

## Em Têbigihin

1- Di barîna berfê de çi guhertin çêbû?
2- Zarok, di berfê de ji çi lîstokê re tên gazîkirin?
3- Hûn ji gotina “*Em çêbikin peykerekê*” çi fêr dibin?

## Destûrên Ziman

1- Li dawiya hevokên li jêr, di helbestê de kîjan hêma hatine bikaranîn?

Van hevokan li lênûsa xwe binivîsin.

**Befir barî, befir barî!**

We li dawiya vê hevokê baneşan (!) danî?

Çi bûye li van deveran?

We li dawiya vê hevokê nîşana pirsê (?) danî?

2- Peyva di hevoka jêr de tarî hatî nivîsandin, bi kîjan pêvekê hatiye herikandin?

Em çêbikin peyker**ekê**.

Em dibînin ku ev peyv, ji peyva ***"peyker"*** bi pêveka ***"ekê"*** hatiye herikandin.

Têkiliyên di navbera wateya ***"peyker"*** û ***"peykerekê"*** de bibînin. Van di hevokan de bikar bînin.

## HÎNDARÎ

**1-Bersiva pirsên li jêr bidin.**

- Sûdên hewaya vekirî û werzîşê çi ne?
- Li gorî demsalan lixwekirina cilan çima pêwîst e?

**2-Dema mamosteyê we helbestê dixwîne li van xalan şiyar bin.**

- Li dawiya rêzikê li kîjan hêmanê çiqas radiweste!
- Her rêzikekê bi pivana dengekî çawa dixwîne?
- Hevalê we yê herî xweş helbestê dixwîne mînak bigirin.

# KEWARA MÊŞAN

Vizvizoka reş û zer, ji ser kulîlkekê diçû ser kulîlkeke din. Tûrê xwe bi şêlika gulan dadigirt. Dema vedigeriya malê, hevalên xwe didîtin û bi hev re berê xwe didan selamêşa.

Di selamêşa de, gelek mêşên hinguv hebûn. Her yekê erkek wê hebû.

Vizvizokê û hevalên xwe şêlika ku anîbûn xist nav şana di kewara mêşan de. Di gelek şanan de kurmikên mêşan hebûn.

Di kewarê de jî Keybanûyek hebû. Keybanû ji mêşên din hîn mezintir, erka wê jî ku hêkan di şanan de bike.

Wê jî her roj çend hêkan di şanan de dikirin. Kurmikên ji hêkan derdikevin piraniya wan dema mezin dibin weke Vizvizokê dibin mêşên karker û Şêlika gulan kom dikin; li kurmikan dinêrin; selemêşê paqij dikin.

Xwşka vizvizokê bi meyzandina kurmikan erikdarbû, rojekê wê û hevalên xwe dîtin ku Keybanûyek digihê. Dema Keybanûya mezin bihîst, gelek bêzar bû. Bi hin mêşên li derdora wê kom bûbûn darekê danîn. Keybanûyê mêş xistin hundirê kewareke nû. Mêşên hinguv bi hemû hêza xwe xebitîn û mala xwe ya nû bi şanan xemilandin. Şan, ji bo zivistanê bi hinguv dagirtin.



## Wateyên Peyvan

**Erk:**Peywir
**Şan:**Hêlînokên mêşên hingiv
**Kewar:** Selemêş, gurbe
**Şêlik:**Toza gul û kulîlkên ku hinguv jê çêdibin.

## Em Têbigihin

1- Vizvizokê û hevalên xwe, li hundir û derve çi dikin?
2- Karê keybanûyê çi ye?
3- Keybanû, ji ber çi bi komeke mêşan re ji selemêşê derdikeve?

## Destûrên Ziman

1- Paşgira peyva karker jê hatiye veqetandin. Hûn jî ya din veqetînin.

*Kar - ker mêşvan*

2- Di mijarê de tîpên destpêkê yên hevokan çawa hatine nivîsandin? Li dawiya hevokan kîjan hêmayên nivîsînê hatine bikaranîn? Ji serî heya dawiya mijarê lêkolîn bikin. We dît ku tîpa destpêkê ya hevokan mezin e û li dawiya hevokan xal (.) hatine bikaranîn.

3- Hevoka li jêr a di mijarê de derbas dibe, wekî hûn jî dibînin peyvên wê têkel hatine nivîsîn. Cihê van peyvan rast bikin û hevokê saz bikin.

**jî Keybanûyek de hebû kewarê di**

## HÎNDARÎ

1- Li jêr, destpêka çîrokekê hatiye nivîsandin. Vê çîrokê li gorî daxwaza xwe temam bikin û di refê de ji hevalên xwe re bixwînin.

**Hebû tune bû xalxalokek hebû...**

2- Nivîsandinê bêdeng bixwînin. Ji bo zêdekirina leza xwendinê bixebitin.

3- Li hevalên xwe yên ku mijarê bi dengekî bilind dixwîne baldar bin:

-Dengê wî xweş tê bihîstin?

-Bi dengekî xwezayî û bi wate dixwîne?

4- Hûn ji bo pirtûkxwendinê hewl didin?

Hûn ji pirtûkxaneyên derdora xwe sûd digirin?

Hûn ji bo dewlemendkirina pirtûkxaneya li mala xwe dixebitin?

# HEŞTÊ ADARÊ

***Hêlîn***: Îro 8'ê Adarê ye û rojeke pîroz e. Em jî bi vê rojê gelek dilşad in.

***Sîdar***: Ji bo çi rojeke pîroz e?

***Hêlîn***: Weke tê zanîn, di 8'ê Adara 1871'an de, di kargeha Kotal de, li bajarê Newyorka Emerîkayê jinên karker ji bo mafên xwe serî hildan. Karbidest û dewlet bi hev re bi ser wan de çûn. Di wê êrîşê de gelek jinên karker jiyana xwe ji dest dan.

8'ê Adarê ji sala 1910'an û pê de weke 'Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê' hatiye pejirandin û tê pîrozkirin.

***Sîdar***: Gelo ji bo me çi wateyên wê yên taybet hene?

***Hêlîn***: Belê, hevala Sîdar! Têkoşîna me ya ji bo azadiyê didome. Aliyekî wê yê girîng berdewamiya têkoşîna jinê ye.

***Sîdar***: Çawa?

***Hêlîn***: Azadiya jinê, azadiya civakê ye.

***Sîdar***: Jin di jiyanê de ewqas girîng e?

***Hêlîn***: Ma te nebihîstiye? "Jin jiyan e." Jin dayîk, eşq û evîn, hezkirin û hembêzkirin, delalî û zelalî, dilnizmî û dilxweşî ye. Çavkaniya avakirin û çêkirinê ye.



## Wateyên Peyvan

**Dilşad:** Dilxweş, kêfxweş
**Kargeh:** Cihên ku tişt lê tên çêkirin.
**Karbidest:** Berpirsyar
**Çavkanî:** Jêder

## Em Têbigihin

1- Hêlîn ji hevala xwe re çi rave dike?
2- Ji kengê ve 8'ê Adarê tê pîrozkirin?
3- Azadiya jinê tê çi wateyê?
4- Jin çavkaniya çi ye?

## Destûrên Ziman

Peyvên li jêr ku di nivîsandinê de derbas dibin, ji bo çi navên yekjimar in.

*jin, karker, têkoşer*

Navên li jêr pirjimar in. Pirjimarî di nav hevokê de pêk tê.

Mînak:

Jin**ên** Kurd
Maf**ên** jin**an**
Karker**ên** welatparêz

Ji ber ku pêveka pirjimariyê "ên" girtine bûne pirjimar.

Van navên li jêr ên yekjimar bikin pirjimar.

*"karbidest, cejn, sal"*

## HÎNDARÎ

1- Mijarê bê deng û bilez bixwînin.
2- Mijarê di refê de bi deng û rast bixwînin.
3- Dema hevaleke we bi deng dixwîne, bi baldarî guhdarî bikin û bi tiştekê ve xerîk nebin. Di cihê xwe de bi asayî û rast rûnin.



## TEST 3



**1-*Bersivarast li jêr bi tîpa (R) ya şaş jî bi tîpa (Ş) nîşan bikin***

1-di gotina" jinên kurd "peyva jinên yekjimar e (   )

2-wateya peyva" **Bexşandin":** Lêborîn ne      (   )

3-Di mijara "kewa mêşan". Mêşên hingiv bi hemû hêza xwe dixebitîn û mala xwe ya nû bi şanan xemilandin.şan, ji bo zivistanê bi hingiv dagirtin..(   )

**2- *Bersiva rast li jêr hilbijêre.***

**1- Erka keybanûya mêşa çi ye?**

a) Danheva şêlikê gulan.
b) Çavdêriya li kurmikan.
c) kirina hêkan di şanan de.

**2- Kîjan navê li jêr taybet e?**

a) Pênûs
b) Dibistan
c) Aram

**3- Kîjan hevoka li jêr rast hatiye nivîsîn?**

a) Cotkar kedkarê welat e.
b) Çû mal ew.
c) Xwe nekir amade ji şer re

**4- Roja Jinan kengê ye?**

a) 21'ê Adarê
b) 8'ê Adarê
c) 1'ê Gulanê

# BEŞA 4

## DIRAVÊN AMADE

Qerdarê Behlûl tê, qerê xwe ji Behlûl dixwaze.

Behlûl:

-Bi Yezdan, niha diravên min nîn in; lê ez ê di demeke nêzîk de bidim te.

Zilam xwe vedikişîne:

-Tu yê kengî û çawa bidî min?

Behlûl:

- Li pêş mala min deviyên stirî hene, di demsala biharê de wê şîn bibin.

- Êêê!...

- Dema pez di nav deviyan re derbas bibe, hirîya pêz wê bi stiriyan ve bimîne.

- Erê!..

- Xatûna min, wê hiriyê kom bike, birêse û bike rîs.

Ez ê wan bibim bazarê bifiroşim û diravên te bidim te.

Dema zilam, bi dengekî bilind dest bi ken kir...

Behlûl:

- Hey gidî, dema diravên amade dibîne, çawa dikene.



## Wateyên Peyvan

**Ristin:** Ji hiriya mîh û mûyên bizinan çêkirina ben.
**Qerdar:** Deyndar, kerdar
**Dirav:** Pere

## Em Têbigihin

1- Zilam, ji Behlûl çi xwest?
2- Behlûl, riyeke çawa ji qerdarê xwe re pêşniyar kiriye?
3- Qerdar, çima bi vê pêşniyarê kenî?

## Destûrên Ziman

Di çîrokê de, li dawiya peyva li jêr hêmaya baneşanê hatiye bikaranîn.

Vê peyvê li lênûsa xwe binivîsin.

- Êêê!...

Li dawiya hevokên ku kelecan, tirs, coş û xuroş têde hebin hêmaya baneşanê tê dayîn.

## HÎNDARÎ

1- Bêyî li pirtûkê binêrin, çîroka li jor, du bi du zindî bikin.
2- Lîstoka hûn dilîzin, bi liv û tevgeran dewlemend bikin.
3- Fêrî çîrokeke Behlûl bibin. Vê çîrokê, bi hevokên xwe binivîsin. Dema hûn dinivîsin, li ser destûrên nivîsînê û hêmayên nivîsînê şiyar bin.
4- Çîrokê, pêşî bêdeng bixwînin.

# ZAROK Û LÎSTOK

Dema zarok li hev kom dibin û ji xwe re dilîzin, dilê wan tijî kêf û şahî dibe. Lê Kesên mezin di warê lîstinê de xwediyê nêrînên cuda ne. Dibêjin: “Hûn ê cil û bergên xwe bikin herî û gemar.” Bi vê helwestê ji lîstinê re astengiyan derdixin, lê lîstin ji bo tenduristiya zarokan pir baş e.

Belê; dema ez di dibistana seretayî de bûm, ez rojekê di navbera du waneyan de, ji refê derneketibûm. Ez li cihê xwe rûniştibûm, min pirtûkek dixwend. Li derve jî baraneke hûr dibariya. Hemû hevalên min ji xwe re dilîstin. Mamosteyeke me ji der ve hat. Bi destê min girt û ez derxistim derve û got:

-Pêwîst e zarok, zarokatiya xwe bijî. Dema xwendinê xwendin, dema lîstinê lîstin.

Ev çend sal in, min ev gotin ji bîr nekiriye. Piştî ez mezin bûm, rastiya vê gotinê tê gihîştim. Dostanî, hevaltî û hevkarî bi lîstokan tên destpêkirin. Bi vê boneyê her roj di baxçê dibistanê de, min bi hevalên xwe re gog û lîstokên din dilîst.



## Wateyên Peyvan

**Cil û berg:** Libas, kinc
**Gemar:** Qirêj
**Tenduristî:** Saxlemî
**Helwest:** Ray, nêrîn
**Bone:** (Munasebet)

## Em Têbigihin

1- Li gorî têgihandina nivîsînê, yên mezin ji ber çi astengiyan derdixin, hûn tevlî dîtina wan dibin?
2- Lîstin çima ji bo zarokan pêwîst e?
3- Xwendekar kîjan gotina mamoste ji bîr nekiribû?
4- Tu ji kîjan lîstokê hez dikî?

## Destûrên Ziman

**1-** Hevokên li jêr, li lênûsa xwe binivîsin.
*Hemû hevalên min ji xwe re dilîstin.*
*Bi destê min girt û ez derxistim derve.*
2- Di nav hevokan de peyvên kar (kiryarê) diyar dikin kîjan in? Binê wan xêz bikin.
3- Peyvên kar diyar dikin "dilîzin" û "derxistim" we dîtin?
*Di hevokê de ji peyvên kirinekê diyar dikin re* ***kar*** *tê gotin.*

.

## HÎNDARÎ

1- Di nivîsa we xwendî de, ji bilî tiştên hatine têgihandin, lîstin, kîjan sûdan dide mirovan? Bi hevalê xwe re şîrove bikin.
2- Dema hûn bi hev re dilîzin, pêwîst e hûn çi tiştan li ber çavan bigirin? Van destûran di refê de bi hev re diyar bikin û li lênûsa xwe binivîsin.

## XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

Destnivîsa xwar, tîpên biçûk û mezin li jêr çawa hatine nivîsîn, lêkolîn bikin. Wan rast û bi şêweyeke xweşik li lênûsa xwe binivîsin.

***Tîpên Biçûk***

*a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z*

***Tîpên Mezin***

*A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z*

# NALÎNA KURDISTANÊ

Gelek gund li kurdistanê hene, di gundekî ku dikeve rojavayê başûrê kurdistanê de, lawikekî pir jîr û bimereq hebû. Hemû gundiyan ji wî lawikî hez dikir. Ji ber ku wî lawikî her ku pirsgirêkek dîtiba li ser çareseriya wê bê navber dixebitî. Ew lawik weke firişteyekê di gund de dihat naskirin.

Rojekê ji rojan lawik di xewna xwe de diçe ber kaniyekê, li bin siya çiyayan, li ber hilm û bîna gulan û dinav xweşbûna xwezayê de rûdinê. Dengê nalîneke kûr dibihîze, dipirse.


-Ew kî ye, ev nalîn ya kê ye?

- Ez im çiya me, kanî me, ax im, av im, dar û daristan, deşt û zozan, gul û gulîstan, ez kurdistan im.

Lawik matmayî dimîne û dibêje:

-Çima dinalî, Mane tu xwediyê her tiştî yî, ma ev tiştên ku te rêz kirin ne besin, ji bo dilê te geş bikin?







Kurdistan:

- Lawikê delal, lawikê hêja, ji despêka mirovahiyê ve hûn li ser vê xakê dijîn, lê we ez di bin lingê biyaniyan de hiştim e, bi sedê salane ji ber ne parastina we xêr û bêrên min ji xwe re dibin û li hev par dikin. Ne tenê wilo, ax, av û bayê min jî gemar dikin. Ma ezê çawa kêfxweşbim û nenalim, lawê min î delal.

Bi van gotinan re lawik di nav xwêdaneke germ de ji xew hişyar dibe û êdî di wê şevê de xew bi çavên wî nakeve. Li ser pirsgirêka kûr a dayika xwe ya mezin Kurdistan dihizire û ji xwere dibêje: "bi rastî jî waye, dayika me ya mezin Kurdistan rast dibêje. Em hemû bi dû tiştên vala ketin û me êş û janên welatê xwe ji bîr kirin."

Ev xewna han ji bo lawikê jîr bû bingehê rêxistinbûnek niştimanperwerî û bi vê re ruhê ciwantî û welatparêziyê dinav civakê de da belav kirin û ji bo xaka welat dest bi têkoşînê kir.



## Wateyên Peyvan

**Firişte:** (Milyaket)
**Matmayîn:** Şaş mayîn, behitîn
**Berhem:** Destkeftî
**Niştimanperwer:** Welatparêz
**Biyanî:** Kesê nenas
**têkoşîn:** Hewldan û xebat

## Em Têbigihin

1- Lawikê hêja mirovekî çawa bû?
2- Lawikê hêja di xewna xwe de çi dîtibû?
3- Kurdistanê ji lawikê hêja re çi gotibû?
4- Lawikê hêja piştî xewna xwe çi kir?

## Destûrên Ziman

Di hevoka jêr de, peyvên ku çawaniya lawik diyar dikin, bibînin.

"Di gundekî Kurdistanê de lawikekî pir jîr hebû." Weke hûn dibînin di hevokê de peyvên "*pir û jîr*", çawaniya lawik diyar dikin.

*Ji peyvên ku rewşa navekî diyar dikin re **hevalnav** tê gotin.*

## XWENDEKAREKÎ JÎR

Ez xwendekarekî jîr im.
Zana û bi hiş û bîr im

Hez dikim ji dibistanê.
Bo xizmeta Kurdistanê.

Dixwînim bi zimanê xwe.
Da ez nas bikim gelê xwe.

Armanc ne şer e aştî ye.
Ji bo welat azadî ye.

Çek û pênûs hevalbend in.
Ew bi hev re dewlemend in.



## Wateyên Peyvan

**Bi hiş û bîr:** Zana, bihiş
**Jîr:** Jêhatî
**Hevalbend:** Kesên hevaltiya hev dikin

## Em Têbigihin

1- Xwendekar xwe çawa dide naskirin?
2- Çima xwendekar ji dibistanê hez dike?
3- Armanca xwendekar ji zanabûnê çi ye?
4- Ji bo azadiyê çi tê xwestin?

## Destûrên Ziman

1- Azadî çi ye? Hîn bibin û di hevokê de bi kar bînin.
2- Peyva “*pênûs*”ê di hevokekê de bi kar bînin.

## HÎNDARÎ

1- Ji bo hûn cihêkî nas bikin ku hûn biçinê, divê hûn pirsên çawa bikin? Bi vê armancê pirsên wiha pêk bînin:
***-Ez çawa dikarim biçim nexweşxanê?***
***-Hûn dikarin vê navnîşanê bidin nasîn?***
2- Kesên ku pirsên wiha ji we bikin, bersivên rast bidin.

**Navên lehengên Kurdan ên li jêr di xaçepirsê de bibînin.**



Arîn

Gênco

Seydo

Serhed

Silava

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| A | Î | S | O | W | l | S | Z |
| R | E | E | H | E | D | l | Î |
| Î | O | M | A | N | S | L | l |
| N | A | S | Î | R | E | A | A |
| X | E | B | A | T | Y | V | N |
| Ş | Ê | R | Ê | J | D | A | E |
| N | G | Ê | N | C | O | T | T |
| E | Î | R | O | A | Y | û | N |
| V | l | S | E | R | H | E | D |

## DARA GÛZÊ

Dara gûzê ya ku dirêjiya wê dighêje deh ta sî û pênc metreyan (10 - 35 m), yek ji darên temendirêj e ku bi sedê salan dijî.

Darên gûzan yên ku li berav û cîhên çiyayî çêdibin, bi xemla pelên xwe û bejna xwe ya bilind herêmên ku lê şîn dibin, seyrangehan jî dixemilînin. Her wiha ji bilî vê jî ji dara gelek tiştên nav malê û amûrên wekî mêze, kursî, dolab û tembûr jî tên çêkirin.

Gûz ên ku di demsala payîzê de dighêjin, di hemû demsalan de peyda dibin û bi taybet di demsala zivistanê de tên xwarin, pir bi sûdin. Hin ji wan sûdan ev in:

- Ji bo bikaranîna mejî, hizir û bîra mirovan pir başe.
- Li himber nexweşiyan ji bo bihêzkirina laşê mirovan xwarinek bisûde.





## Wateyên peyvan

**Temen dirêj:** Zêde jiyan dikin

## Em têbigihin

1- Dara gûzê heta çend metreyan bilind dibe?
2- Gelo te dara gûzê dîtiye?
3- Di kîjan demsalê de gûz digihîjin?
4-Ji dara gûzê çi çêdibe?

## Hîndarî

Hûn çi darên fêkiyan nas dikin?
Hûn jî dikarin sûdên cûreyek dar li lênûsa xwe binivîsin?

## GULA DEVLIKEN

Hebû nebû, dibêjin di demekê de paşayek hebû. Fermanek derxist û ew ferman wiha ji wezîrê xwe re raghand:

- Ji niha û pêde di vî welatî de ahtina du kesan li gel hev qedexe ye!

Wezir fermana paşa li kuçe û kolanên welat belav dike û Piştre paşa fermana qedexekirina kenînê jî dide. Li ser fermana paşa, ji tirsan êdî tu kes nedikeniya û nedibişirî. Hemwelatiyan ken û kêf ji bîr kiribûn. Her kes di nava hizir û bîrên tarî de dijiya.

Di wî welatî de keçeke biçûk û bêderfet hebû. Ew keçika dilxemgîn, rojekê ji rojan bê rawestan giriya û du rondik ji çavên wê dikevin nav axê. Ji wan rondikan kulîlkeke spî şîn dibe. Kulîlk roj bi roj zêde dibin. Kesên ku li wan kulîlkan dinêrîn dilê wan tijî hezkirin dibe.

Kulîlk her roj bi dengekî xweş “haa, haaa” dikeniya.

Keçika ciwan, ew kulîlk belav kirin û bi wan kulîlkan welat tijî hezkirin û ken kir.

Di dawiyê de ev kulîlk gihîşt destê paşa û dilê wî jî geş kir. Bi qasî ku paşa kêfxweş kir, ew qasî jî hişt ku ew dest bi hizirînên baş bike. Bi wê re paşa tevahiya qedexeyan radike, kêf û xweşiyê vedigerîne tevahiya welat û bi vê re ji gel re dibe paşayekî baş.



## Wateyên Peyvan

**Ferman:**Emir
**Bişirîn:**Girnijîn, beşişîn, devlikenî
**Sêwî:** Zarokên ku dayîk an bavê wan an jî herdu tune
**Çarenûs:**bext, qeder
**Rondik:**hêstirên çavan, firmêsk

## Em Têbigihin

1- Padîşah di welatê xwe de çi qedexe kiribû?
2- Qedexeyan li welatiyan bandoreke çawa kiribû?
3- Kulîlka spî ya devliken çawa derket holê? Rê li ber çi vekir?

## Destûrên Ziman

1- Navên kulîlkên li jêr di nava hevokan de bi kar bînin. Wan hevokan li lênûsa xwe binivîsin.

***"Şîlan, nêrgiz, şilêr, sosin"***

2- Di hevoka li jêr de rengê kulîlkê çawa bû?


"Ji wan rondikan kulîlkeke **spî** şîn bû."

*Vê hevokê li lênûsa xwe binivîsin. Peyvên reng didin diyarkirin nişan bikin. Ji wan peyvan re* ***hevalnav*** *tê gotin.*

## XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

**Peyvên li jêr li lênûsa xwe binivîsin.**

**Evîn, jan, negirî, viyan**
**Lale, xemgîn, Wan, keştî**



## ÎKLO DÎKLO

Îklo dîklo
Du nazir
Şepip rapip
Tutî zerî
Mamê siyê
Yêl bin biyê
Ew dîklokê
Çav spiyê
Xêçî mêçî
Kêçî mêçî
Qesra du der
Çûyîme der
Elah û ekber

Gul im gula nizara
Ew tayîka çinara
Çinaroka xaxolî
Îmamoka Babilî
Babilî dê jin bînî
Em nadin, em nadin
Heta xirxirok badin
Xirxirok ji me dûr in
Wê li bin şetê Xabûr

Şetvano, şetfiroşo
Hespê qemer dadoşo
Were bin dara zeytûnê
Selam û elêk pîra xatûnê

Ho ho ho mihê
Sofyan berdan pê mihê
Heta ber Çemê Kerxê
Çemê Kerxê dirêj e
Sofyan li ser kir nimêj e
Çûm newalek têr guhêj
Sofyan li ser kir qîj wîj
Em sofiyên didan tîj
Te gûz an te mewîj
Min ewîj û min ewîj.



## ZAROK Û GUL

Zarokek biçûk bi tevahî pereyê xwe gulek ji gulfiroşekê kirî. Destmala xwe şil kir. Gula xwe xist nava destmalê, zû gihişt mal û gula xwe di hewşê de çand. Binê wê xepart û av da.

Zarok tevahiya şevê, xewn li ser gulê dît. Sibê zû rabû ranebû dît ku belçimên gulê hişk bûne û weriyane binê wê. Dîsa binê wê kola û av da. Belê, tu pêşketin di gulê de çênebû.

Zarok bi rojan ev xebat berdewam kir, lê ne gulê serê xwe ji nava axê hilda, ne jî zarok ji wê xebatê bêzar bû. Beyaniyekê dema zarok ji bo avdanê daket jêr, gulê serê xwe yê sor ji nava axê hildabû û bi wî re keniya û got:

- Roj baş!

Zarok ji çav û guhê xwe bawer nekir. Dema pelê gula xwe ya sor dît, ewqas kêfxweş bûbû ku!...

Got:

- Lê te ez pir mijûl kirim, dîsa jî min hêviya xwe ji te qut nekir. Belê te bi rojan serê xwe nîşanî min neda.

Gulê bersiv da û got:

- Rast e. Belê ez dixwazim tu vê bizanî; Bextewariyên ku bi hêsanî tên bidestxistin, demdirêj nabin. Ji bo bextewariyê, pêdivî bi kedeke gelekî zêde heye.



## Wateyên Peyvan

**Bextewer:** kêfxweşbûn, şadbûn, xoşbext
**Ked:** Ji bo karekê encama bigrî hewldana ku tê dayîn
**Xepar:** Kolandina ber qurmê şitil û daran
**Weriyan:** weşîn

## Em Têbigihin

1- Çi tiştî zarok mijûl kir?
2- Di dawiyê de gulê xebata zarok bi çi xelat kir?
3- ji bo bextewariyê pêdivî bi çi heye?

## Destûrên Ziman

1-“*Zarok ji çav û guhên xwe bawer nekir.*” Kîjan navên di hevokê de xwerû hatine nivîsandin?

*Ew navên ku ji yek peyvê pêk tên, pêşgir û paşgiran nagirin, jê re navên **xwerû** tê gotin.*

2- Benda destpêkê careke din bixwînin.

-Di wê bendê de çend hevok hene?

-Tîpa destpêka hevokê, bi tîpeke çawa hatiye nivîsandin?

-Li dawiya hevokan çi hêma hatiye danîn?

-Di hevoka benda dawiya nivîsînê de bêhnok li ku derê hatiye danîn?

## HÎNDARÎ

1- Ji bûyerên ku we kêfxweş dikin, yekê binivîsin.
2- Ji bo zû û rast xwendina mijarê bixebitin.
3- Ji dûrahiya di navbera pirtûk û çavên xwe de baldar bin.

# BIHAR Û ENDÎWER

Bi rê de ber bi Dêrikê diçûm, di rêwîtiyê de komek zarok bala min kêşan ku li ser waneya Kurdî dixebitîn, pir kêfa min ji wan re hat. Hema wilo, min jî ji wan pirsî "çend werzên salê hene, hûn dikarin bi Kurdî ji bo min bibêjin? " Piştî ku gotin " Havîn, Payîz, zivistan û Bihar" min dîsa ji wan pirsî demsala herî xweş ku hûn jê hez dikin, kîjane?

Gotin: Bihar e û em piranî bihara xwe li Seyrangehên Endîwerê derbas dikin.

Paşê min xwest bizanim ka wê çi bersivê bidin min: Ji bo çi hun ji demsala biharê hez dikin?

Gotin: çawa em jê hez nekin? Piştî zivistana reş û dirêj, sar û seqem êdî dinya kirasekî nû û rengîn li xwe dike. Xweza wekû şemamokê tijî hez kirin dibe. Her der xemlekî nû li xwe dike; dar û devî, mêrg û kanî, deşt û zozan dixemilin. Kulîlk vedibin, avên robaran xweş diherikin û dengê çûk û bilbilan guhên me bi awazên xweş şa dikin û em jî bi wê coş û kelecana biharê, bi dengê def û zurne,



heyranok û payîzokan derdikevin geşt û seyranan.

- Hûn piranî diçin kû derê geşt û seyranê ?

Ji nava wana yekî çavreşî bejin ziravî por xelek li min nihêrî, piçekê keniya, pûzê xwe paqij kir, dû re li hevalên temaşe kir û berê xwe da min:

- Em diçin Endîwerê. Netenê em, piraniya gelê herêma Cizîrê ji bo gerûgeşta tên Endîwerê. Ji ber ku Edîwer seyrangeha herî xweş û bi coş a Kantona Cizîrê ye.

Dema wan got, min mereq kir û min pirsek din li pirsên xwe zêde kir:

- Çi heye li Endîwerê wisa bala gerûgeştyaran dikêşe?

Vêcarê keçikekê hema bibêje temenê wê ji hemûyan mezintir û hinekî qelew e, lê qelewbûneke şêrîn ku perçavkek li ber çavan bû bersiva min weha da:

- Ji ber ku dema em diçin Endîwerê netenê pira Bafê, mîrnişîna Bedirxan Begê Mîrê Botan li bîra me tê. Kêmek jî be di nav têlên sînor de em Cizîra Botan, meskenê Melayê Cizîrî, warê Mem û Zînê dibînin. A din jî, em dotmam û pismamên xwe yên ku bi sînoran em ji hev qut kirine ji dûr ve dibînin.



## Em Têbigihin

1- Di kîjan werzên sale de mirov diçin geşt û seyranan?
2- Çi xweşbûna seyranê li Endîwere heye?

## Destûrên Ziman

1- Di hevoka "*Ma bihar hatî baniya*?" de ji ber nivîsîna peyva "*ma*" em dizanin ku pirsek hatiye kirin.

Ji wan gotinên pirs pê çêdibin re alavên pirsyarî tên gotin. Di dawiya her hevokeke pirsyarî de hêmaya pirsê (?) tê nivîsîn.

2- "Piştî payîzê, kîjan demsal tê?" Di hevokê de jî, peyva "*kîjan*"ê hevokê dike hevoka pirsyarî.

## HÎNDARÎ

1-Hûn bêhtir ji kîjan demsalê hez dikin? Li ser wê di refê de axaftinekê bikin û di dema axaftinê de van li ber çavan bigirin:

-Dema hûn diaxivin vehêz bin, xwe neşidînin.
-Bi dengekî hemû kes bibihîze baxivin.
-Bi awayekî zelal û vekirî bipeyîvin.

## ÇEND ŞÎRETÊN XANÎ

Rojekê Ehmedê Xanî şêst keç û kurên Kurd, birin mala xwe. Piştî kêfxweşî û qedrekî pir mezin, li nav wan rûnişt û wiha ji wan re axivî:

“Ev gotinên min girîng in, hûn di dilê xwe de veşêrin. Hûn biçûk in, hûn geş in, bê derd û xem mezin dibin, dilîzin û dikenin. Ev dema dilgeşiyê ye. Eger hûn dixwazin her dem bextiyar bin û ti caran bêbext nebin, li du tiştan bigerin. Hezkirin û xebat; kî ji we hez bike, jê hez bikin. Ji hevalên xwe hez bikin. Bi şûn de hûn wê hînî hezkirina diya me gişan, Kurdistanê bibin.

Ya duyem jî, bixebitin. Îro jî ji bo hînbûn û zanînê bixebitin. Da ku hûn di hêla dinyayê de bizanin, pêşve biçin. Bibin hêja, serbest û serfiraz.

Dema hûn waneyên xwe baş zanibin, hûn ê dilê mamosteyên xwe xweş bikin, hûn ê jî geş bibin û ji barekî giran rizgar bibin.

Ev her tim wisa ye. Bixebitin da ku her dem dilê we xweş be. Mirovê dil bi ken û vehistî, ti caran nabe bextreş.

Zarokên delal! Ez bi we bextiyar im. Ez dixwazim hûn jî, bi min dilxweş bibin. Da ku welat jî, bi hezkirina me her dem şa bibe.”



## Wateyên Peyvan

**Bêbext:** Bextreş
**Hêjabûn:** Binirxbûn
**Vehês:** Bêhnvekirin

## Em Têbigihin

1-Li gor mijarê zarok di kîjan demê de dijîn?
2-Ehmedê Xanî çi şîret li zarokan kir?
3-Dema hûn dixebitin, çima dilê mamosteyên we xweş dibe?
4-Hezkirina hevalan, mirov fêrî çi dike?

## Destûrên Ziman

1- Hevokên li jêr, li lênûsên xwe binivîsin.

*-Ev gotinên min girîng in, hûn di dilê xwe de veşêrin.*

*-Kî ji we hez bike, jê hez bikin.*

*-Bi şûn de hûn ê hînî hezkirina diya me gişan Kurdistanê bibin.*

*-Ez bi we bextiyar im, ez dixwazim hûn jî, bi min dilxweş bibin, da ku welat jî, bi hezkirina me her tim şad be.*

2-Çi têkilî di navbera wateya peyvên li jêr hatine nivîsîn de heye?

bext - bextiyar
xebat - xebatkar
dil - dildar
evîn - evîndar


## HÎNDARÎ

1-Ji kîjan tevgera we, mirov têdigihîje ku hûn ji hevalên xwe hez dikin?
2-Bextiyariyê bi çend hevokan bidin têgihandin.

## XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

Peyvên li jêr, li lênûsa xwe bi awayekî rast bi hev ve binivîsin. Bi dest nivîsa xwehr, xebatên ji bo nivîsîna rast û spehî bikin.

*al, baş, cam, dûr, ol, fil, gul, hat, jiyan, kum, law, mûm, man, ode, pak, Rêzan, sûr, tav, wan, yek, sil*



# VEGERA LEGLEGAN

Bihar hatibû, derdor şîn bûbû; daran kulîlk dabûn. Li ber deriyê mala Serdar stûneke mezin hebû. Dema legleg dihat, qurmê biyê zindî û şad dibû.

Sibehekê dayîka Serdar, bi dengê bilind got:

-Mizgînî, mizgînî! Legleg hatiye! Kurê xwe ji xewê şiyar kir. Serdar bezî ber kulekê. Di hêlîna li ser dara biyê de du legleg hebûn. Bêhnekê temaşeyî leglegan kir, piştre, li dayîka xwe zivirî û jê pirsî:

-Dayê, çima payîzê legleg van deran berdidin û diçin? Ma evqas ked ne ziyan e?

Dayîk:

-Ma çi bikin kurê min? Zivistanê li van deran nikarin xwarinê peyda bikin.

Serdar:

-Eger wisa ye, bila li wan welatên germ ku diçinê, bi cih bibin.

Dayîk:

-Ji bo zêdebûn û hinek sedemên din tên van deran. Havînê ew der pir germ in. Çêlikên ji hêkan derdikevin, xwe li ber wê germahiyê nikarin bigirin. Dema bihar tê, mar, beq, kurm û marmarîşok pir tên dîtin. Legleg çêlikên xwe bi wan xwedî dikin.

Dema digihên vê derê, hêlînên xwe çêdikin. Piştre leglega mê hêkan dike û dibe kurk.

Dema têjik derdikevin, rojên destpêkê, dê û bavên wan, wan xwedî dikin. Bi salan e, ez temaşe dikim. Çêlikên leglegan, nikilên xwe ber bi jor ve vedikin û bê navber xwarinê dixwazin. Dayîkê gotinên xwe berdewam kir:

-Têr dixwin û mezin dibin. Per û baskên wan bihêz dibin. Fêrî firînê dibin. Payîzê, bi dê û bavên xwe re derdikevin rêwîtiyeke dûr û dirêj.



## Wateyên Peyvan

**Qurm:**Gewdeyê daran
**Kurk:**Qurp, qup, rûniştina balindeyan li ser hêkan
**Bask:**Çeng, per

## Em Têbigihin

1- Qurmê biyan li ber deriyê malê kengî zindî û şad dibû?
2- Legleg payîzê diçin ku derê?
3- Legleg û çêlikên xwe bi çi xwedî dibin?

## Destûrên Ziman

1- Kîjan peyvên hevokên li jêr; hevokan dikin hevokên pirsyarî?

-Ma evqas ked ne ziyan e?
-Ma çi bikin kurê min?
-Qey çi bikin kurê min?

Van hevokan li lênûsa xwe binivîsin. Peyvên wan dikin hevokên pirsê binê wan xêzik bikin.

2- “Dema bihar tê, mar, beq, kurm û marmarîşok pir tên dîtin.” Navên di vê hevokê de bibînin û nîşan bikin.

## HÎNDARÎ

1- Di vê mijarê de, tiştên hûn li ser jiyana leglegan têgihiştin bi çend hevokan, li lênûsa xwe binivîsin.

2- Mijarê ji mamosteyên xwe guhdarî bikin. Bi dengekî çawa dixwîne?

3- Sê kes mijarê bixwînin. Yek agahdariyên di nivîsînê de, yek gotinên Serdar, yek jî gotinên dayîka wî bixwînin.

4- Bêyî ku hûn li nivîsînê binêrin guhdarî hevalê xwe yê mijarê dixwîne, bikin.

# Xecxecok

Xecxecokê xecxecokê
Xweştir ji bîna bîhokê
Rû gewez ji pencê rokê
Tu jîndarî gelo bo kê?!



Xecxecoka evîndara
Pêşkêşa destê dildara
Sebra li ber dilê yara
Xecxecokê xecxecokê

Diyar bûyî bi nazdarî
Bi rengê sor hewesdarî
Kê te çêkir bi nîgarî
Xecxecokê xecxecokê

Birîndar im birîn kûr e
Dikim hawar gazî dûr e
Ji ber te dil arê gûr e
Xecxecokê xecxecokê


***Seydayê TÎRÊJ***

## DAR

Dara ku di beyaniyekê de, weke bûkekê ji kulîlkan xemilandî xwe dide pêş. Ev guhertin, bêyî ku çav bibînin bi awayekî xwezayî tên holê. Kulîlkên daran bêy ku mirov bibînin, vedibin. Di nav bêdengiyê de ji ava çiqilên xwe, ji bo jiyanê hatine amadekirin. Çiqilên daran di nav bêdengiyê de kulîlkan û pelên kesk vedikin. Piştî wê jî fêkiyên rengîn, ji çiqilan xwe berdidin jêr.

Di demsala zivistanê de, di bayekî pir hêdî de, tiştê herî deng jê tê, darên bêpel in. Di demsala biharê de, ba û bahozên di dehlan de ji hejandinê zêdetir mişîneke pir şîrîn tê bihîstin. Ew hejandina giran jî ji bo fêkiyan ziyan e.

Kar di nav bêdengiyê de tê hizirîn; weke pelçimdayîn û fêkîgirtina daran.



## Wateyên Peyvan

**Mişîn:**Xuşîn
**Bahoz:**Bayê gur, bayê bihêz
**Dehl:** Cihên dar û darên fêkiyan lê hatî çandin û avî

## Em Têbigihin

1- Di biharan de guherîna daran çawa çêdibin?
2- Di demsala bihar û zivistanê de dar dengekî çawa derdixin?
3- Hevoka li dawiya mijarê vekin.

## Destûrên Ziman

1- Ji dara ku pelên wê tuneyî re dibêjin dara bêpel.

Wekî hûn dibînin, li pêşiya peyva pel, pêveka "bê" hatiye zêdekirin. Hûn jî vê pêşpêvekê, li ser peyvên "reng, deng, mal" zêde bikin û di nav hevokekê de bikar bînin.

2- Di hevoka jêr de peyva 'kesk' rengê pelçiman diyar dike.

*Dîsa di nav bêdengiyekê de wê pelçimên kesk vekin.*

*Peyva ku çawaniya pelçiman diyar dike, peyva 'kesk e'. Wek tê zanîn em ji van peyvên bi vî awayî re* ***hevalnav*** *dibêjin.*

3- Hûn jî, ji bo peyvên "heval, dar, gul" hevalnaveke peyda bikin û di nav hevokekê de bikar bînin.

## HÎNDARÎ

Bûyerên xwezayê yên ku hûn meraq dikin, ji bo hevalên xwe şîrove bikin.



## TEST 4



***Bersiva rast li jêr hilbijêre***

**.** 1- Kîjan peyvên hevokên li jêr; hevokan dikin hevokên pirsyarî?

-Ma evqas ked ne ziyan e?

-Ma çi bikin kurê min?

-Qey çi bikin kurê min?

2-Nivîskarê helbesta xacxacokê kî ye:

**A)Seydayê tîrêj b)Nalî C)Ehmedê xanî**

**1- Di hevoka “*Welatê me bi bermayiyên dîrokî çiya û avên xwe tê naskirin*” de çend bêhnok hatine bikaranîn?**

a) 3 b) 2 c) 4

**2- Dara Gûzê bi qasî çend metreyan dirêj dibe?**

a) 10-35 b) 53-55 c) 33-50

**3- Ji peyvên ku rewşa navekê diyar dikin re çi tê gotin?**

a) Hevalnav b) Nav c) Cînav

4- di mijara" vegera leglegan" de, di kîjan dem salê de legleg tên welatê me?

a) Zivistanê b)Havînê c) Biharê

5- Hin şîretê Ehmedê Xanî ji bo zarokan ev in:

a) hînî hezkirina diya me gişan, Kurdistanê bibin

b) ji bo hînbûn û zanînê bixebitin.

c) Da ku hûn di hêla dinyayê de zanibin, pêşve biçin.

d) Hemo xalên ders bune

.

## 2BESA 5

### MEHABAD

Ez bajarekî şîrîn im
Ji dozê re evîn im
Gelek mêrxas û egîd
Mîr û gernas û reşîd
Li ser min hatin kuştin
Kovan di dil de hiştin
Bi xwîn xemlandî me ez
Serbilind im bi wan ez
Hêmin, Hejar û Qazî
Perwerandin bi nazî
Diya azadîxwazan
Rewşenbîr, helo, bazan
Xemla min e "Çarçira"
Tê de tev xuşk û bira
Rakir ala rengareng
Hemû yek dil û yek deng
Ey reqîb xwendin bi ceng
Bilind meqam û berjeng
Min deng veda cîhanê
Komara Kurdistanê





MEHABAD

## Wateyên Peyvan

**Doz:** Şop, rê, xet, xwestek
**Gernas:** Egîd, mêrxas
**Kovan:** Xemgîn
**Per:** Bask
**Rewşenbîr:** Ronakbîr
**Helo:** Cûreyeke teyran e, baz

## Em Têbigihin

1-Mahabad li kîjan parçê Kurdistanê ye?
2-Di helbestê de çi bû xemla Mehabadê?

## Destûrên Ziman

Di rêzika "Rakir ala renga reng" de birepeyva "renga reng" bandorek çawa li ser peyva "alê" dike? Em ji wan peyvên li pey nav tên û çawaniya nav didin diyarkirin re çi dibêjin?

"Min pênûsa şîn da Evînê"

Di hevoka jor de peyva "şîn" çawaniya "pênûsê" dide diyarkirin. Bi vê boneyê peyva "şîn"ê hevalnavê "pênûsê" ye.

## HÎNDARÎ

1- Helbestê bêdeng, piştre jî bi dengekî bilind bixwînin. Heya hûn bi awayekî rast û bi wate dixwînin vî karê xwe bidomînin.
2- Helbestê jiber bikin û li pêşiya refê bixwînin.

# XIFŞÊ

Xifşê karika xezaleke pir ciwan bû. Wê şevê nû, ji dayîk bûbû. Li cem dayîka xwe razayîbû. Kêvroşkek ji wir de hat û jê re got:

-Rabe Xifşika delal!

Xifşê karikeke pir nazdar bû. Destpêkê çavekî, paşê jî yê din vekir. Dema xwest rabe ser lingên xwe, lerizî û ket.

Kêvroşk têr pê kenî.

Kêvroşk:

-Tu çiqas giyandareke şîrîn î!

Dema mirov li gel yeke weke te bijî, ti carî ji giyanê xwe bêzar nabe. Ma ne wisa ye? Xifşê bersiv neda. Gelek mandî bûbû.

Kêvroşkê, zêde xem jê nexwar. Ji ber ku dizanî Xifşê, wê rojekê mezin bibe û bi wan re bibe heval.



Şevek di ser ji dayîkbûna Xifşê re derbas bû, fêrî rêveçûyînê bûbû.
Her tiştê ku didît bala wê dikişand û şaş dibû.
Kêvroşk jî, ji bo Xifşê dibû alîkar.
Kêvroşkê:
-Ev lawir, navê wan kew in, çiqas xweşik in, ma ne wisa ye?
Xifşê:
-Lê ev çi ye? Ma ev jî kew e?
Kêvroşk:
-Na, ev perperok e.
Xifşê:
-Perperok e!
Dubare kir û dema kulîlka sosin dît, digot qey ew jî perperok e.
Kêvroşk, gelek bi wê kenî û got:
-Tu dîsa şaş bûyî, ev kulîlk in.
Xifşê, dengekî pir ji dilê xwe got:
-Nexwe, ji hemû kulîlkan re rojbaş!
Her rojên ku derbas dibû, Xifşê di jiyana xwe de fêrî tiştên nû dibû. Di dawiyê de bû xezaleke daristanê ya herî mezin û xweşik.

## Wateyên Peyvan

**Xifş:** Karxezal
**Giyan**: Can, rewan
**Mandî:**Westan

## Em Têbigihin

**1-Di mijarê de karika xezalê çawa tê pênasekirin?**
**2-Kêvroşk çima bi xifşê kenî?**
**3-Çîrok li ku derê derbas dibe?**

## Destûrên Ziman

1- Van peyvên li jêr li gorî rêzetîpan rêz bikin.
Xem- xweş- kew-kar-xezal-roj-xifşê

2- Di zimanê Kurdî de “***tir***” û “***tirîn***” payeya di navbera heyînan de dipîve. Ji wan re **hevalnavê payepîv** tê gotin.

**Mînak:Sor-sortir-sortirîn**

## HÎNDARÎ

1- Di televîzyonê de, bûyerên di navbera lawiran de derbas dibin, guhdarî û temaşe bikin. Di demê guhdarîkirin û temaşekirinê de li ser van xalan baldar bin:

-Di belge fîlmê de kîjan lawir cih digirin?
-Taybetmendiyên lawirên di fîlmê de cih digirin çi ne?
-Belge fîlmeke ku lawiran şîrove dike ji bo hevalê xwe bibêjin.
-Belgê fîlmê ku we şîrove kirî, bi çar-pênc hevokan binivîsin.

2- Dema ku hûn mûzîkê guhdarî dikin an jî fîlman temaşe dikin, kesî bêzar nekin.

## ROVÎ Û GUR

Hebû nebû ji Yezdan gewretir nebû. Dibêjin demekê roviyekî pir xwedî dek û dolab hebû. Sal çûn, dem derbas bûn, roviyê fêlbaz, lewaz û nexweş bû. Beyaniyê zû li rex goleke avê, li nêçîrê digeriya. Ji nişka ve gurekî birçî derket, êrîşî roviyê nexweş kir ku wî bixwe. Roviyê nexweş rûnişt û dest bi girî kir û got:

- Ez nakevim xema ku tu min bixwî! Bihêle, ez cara dawî kudikên xwe bibînim. Paşê tu min bixwî jî xem nake.

Gur ji rovî pirsî û got:

- Ma tu vê beyaniya zû li ser vê gola sar çi dikî?

Rovî got:

- Ez hatibûm nêçîra masiyan. Ev karek pir asayî ye, ez ê nîşanî te jî bidim. Heya ez biçim kudikê xwe bibînim û bêm, tu yê jî çend masiyan bigirî.

Gur:

- De zû nîşanî min bide, da ez jî çend masiyan bigirim.

Rovî:

- Li ser keviya golê rûne. Dûvê xwe dirêjî nava avê bike.

Heya demekê masiyê bên û bi dûvê te ve daliqin. Dûvê xwe ji avê bikişîne. Çend masî wê bi dûvê te ve derkevin ser reşahiyê. Di wê demê de tu wê masiyên xweş û paqij bixwî.

Gur li ser keviya golê rûnişt û dûvê xwe weke rovî gotî dirêjî nav golê kir, da ku masiyan bigire.

Ji rovî re got:

- Here kudikên xwe bibîne û zû were!

Roviyê fêlbaz jî ber bi gundekî têr kûçik ve çû. Xwe nîşanî kûçikên gund da. Kûçikên gund hemûyan bi bev re êrîşî rovî kirin. Rovî ber bi golê ve revî. Wê beyaniyê gelek sar bû. Gol qerisî bû. Dûvê gur jî di nav qerîsokê de asê ma bû. Rovî silav li gur kir û got:

- Tu çi dikî mamê gur?


Gur:

- Tu dizanî, ez masîgir im.

Rovî:

- Ma bavê te nêçîrvan bû. Ma bapîrê te nêçîrvan bû?

Şûna ku kûçik biçin rovî, çavên wan li gur ket. Êrîşî gur kirin.



## Wateyên Peyvan

**Gewre:** Mezin
**Beyanî:** Sibe, serê sibê, spêde
**Fêlbaz**: Hîlekar

## Em Têbigihin

1- Rovî li ber gola avê li çi digeriya?
2- Rovî nêçîra masiyan çawa nîşanî gur kir?

## Destûrên Ziman

Li dawiya hevokên jêr kîjan hêma tên danîn?

*Xal (.)  Pirsnîşan (?)  Baneşan(!)*

-Roviyê nexweş rûnişt û dest bi girî kir
-Here kudikên xwe bibîne û zû were
-Tu çi dikî mamê gur

## MIJARA SERBEST

# BILBILÊN DI RIKEHAN DE

Rojek ji rojên payîzê bû. Pîremêrek di destê wî de gopal, hêdî hêdî di rê de diçû. Dît ku zarokek ber bi wî ve tê. Di destê zarok de rikehek û di rikehê de du bilbil hebûn. Bilbilan rikeh didan ber nikilan û hewildidan ku xwe derxînin. Pîremêr, li ser vê rewşa bilbilan, pir dilteng bû. Piştre ji zarok pirsî:

- Tu yê bi kû ve herî?
- Ez ê herim bazarê û van bilbilan bifiroşim.
- Baş e, bifiroşe min. Ez ê van bilbilan bikirim. Tu nafiroşî min?
- Belê, çima nefiroşim?

Pîremêr ji bêrîka êlekê xwe dirav derxist û da destê zarok. Rikeh ji destê zarok girt. Destpêkê bilbilek ji rikehê derxist. Piştî bîstekê destê xwe li ser perên wê gerand û berda. Bilbil ji nişka ve, çengê xwe vekir, bi şahî dest bi firînê kir. Heman tişt ji bo bilbilê duyem jî kir.



Li ser vê yekê zarokê biçûk matmayî bûbû. Zarok, carekê li diravê di destê xwe de, carekê jî li pîremêr nêrî û piştre jê pirsî:

- Bo çi te wisa kir mam? Çima te bilbil berdan?

Pîremêr kenî û wiha bersiv da:

- Binêre lawê min, ji beriya çend salan şoreşeke çekdarî çêbû. Ji bo ku em welatê xwe, ji bin destê neyaran derxin, me şer dikir. Aha di wî şerî de, ez birîndar bûm û dîl ketim destê neyaran. Her wekî van çûkên di destê te de bûm. Ji bo ez rizgar bibim, min jî tim hewildan dikir. Weke ku dilê min dixwest, min nedikarî tevbigerim. Dîlî û bindestî tiştekî gelek zor û zehmet e!

Pîremêr bi çavên xwe yên şil ev axaftina xwe berdewam kir.

- Tu dizanî çima min bilbil serbest berdan? Ew ne çûkên rikehan in. Çawa dixwazin bila wisa bifirin. Dixwazin li ser çi rawestin, bila rawestin. Bila ji dîliyê rizgar bibin.

# KULÎLK

Dayîka min nexwendîbû. Lê xwediya hesteke erênî û zanîneke pir mezin bû. Ev hesta erênî û zanîna xwe ji xwezayê girtibû. Hemû dayîkên cîhanê mirovên herî baş û pîroz in.

Rojekê min ji baxçe, kulîlkek çinî û ji bo dayîka xwe anîbû. Dayîka min pir dilşad bûbû.

Dayîka min got:

- Ka em hinek kulîlkên din jî biçinin.

Em çûn nav baxçe. Kulîlkek nîşanî min da û got:

- Lê binêre lawê min, ev kulîlk çiqas xweşik e. Ev kulîlk jî giyandar in. Giyanê wan jî heye. Eger em jê bikin, wê rebenan bimirin. Her kulîlk bi tayê xwe ve xweşiktir radiwestin.

Li ber serê her kulîlkekê rawesta û ji min re got:

- Ger dilê te bigire, tu dikarî jê bikî.

Çi taybetiyên min ên baş hebin, ez hemû deyndarê dayîka xwe me.



## Wateyên Peyvan

**Reben:**Belengaz, jar
**Giyan:**Can, rewan

## Em Têbigihin

1- Nivîskar, di benda mijarê ya yekem de, kîjan taybetmendiyên dayîka xwe tîne ziman?
2- Zarok, rêz û viyana xwe di kîjan hevokan de, ji bo dayîka xwe diyar dike?
3- Dayîkê li ser mijara kulîlkan, bi çi awayî kurê xwe şiyar kir?

## Destûrên Ziman

1- Ji derveyî kulîlkan di baxçeyên malan de kîjan fêkî û bêzûrên dîtir tên çandin?

Di lênûsa xwe de fêkî û bêzûran bikin sergotar. Di bin van sergotaran de ew fêkî û bêzûrên hûn dizanin rêz bikin.

2- “Sêyem”, “min”, “dayîkên” van peyvan di valehiyên jêr de bi cih bikin.

Refa............
Dayîka .......
.......... cîhanê.

## HÎNDARÎ

1- Her dem em rêzê ji bo dayîka xwe digirin. Sedema vê çi ye? Bi çend hevokan bidin diyarkirin.

2- Li ser vê gotinê nivîsekê binivîsin. “Her kulîlk bi tayê xwe ve xweşik e.”

# LEHÎ

Dîlan, ji malan kêmekê wê de, li rexa perava celalî ji bo xwe aşokê avê çêdikir. Ji aliyekî bi awaza xwe ya xweş, stran digotin. Ji celalî coya avê danî ser aşoka xwe.

Li esmanan germahiyeke demkurt hebû. Pelçimek ji daran nedihejiya. Dîlan ji nişka ve bêdeng bû. Dengekî pir kûr bihîst. Gurîna esmanan ji dûr dihat. Li serê çiyayê gundê Satê ewrên reş kom bûbûn.

Dîlanê di dilê xwe de digot; “Xwezî baran nebariya, da lehî çênebe!”

Di wê demê de, li nav gund gengeşe hat bihîstin.

- Lêhî hat ha!.. Xwe bidin aliyekî!... Birevin!...

Dîlana hejar ji ber dengê lehiyê, dengê gundiyan nedibihîst.

Serê lehiyê hat dîtin. Di demeke kurt de Dîlan binav bû. Dema avê Dîlan diherikand kevir li laşê wê diketin; dest û lingên wê jî, ji ber qafoyên daran giran dibûn. Her cara ku serê wê li ser avê diket, bêhna xwe vedida û dida ber qîran. Di navberekê de, ji dengê lehiyê zêdetir dengekî cuda bi ber guhê wê ket.

- Dîlan xwe bi darê ve bigire, xwe bavêje darê!

- Keça min, dilê min!

Dengê duyem, dengê dayîka Dîlanê bû. Ew hêza wê ya belavbûyî, bi vî dengî komî ser hev bû.  Dara ku li pêşberî wê bi zorê destekî xwe dirêj kir û dar girt.

Dayîka wê got:

- Dîlan keça min, darê bi hêz bigire. Keça min, berxwedanê bike!

Dîlanê hemû hêza xwe ser hev kom kir. Destê xwe dirêjî darê kir û dar girt. Xwe ji avê derxist. Bêhneke kûr kişand û ji avê derket. Rizgar bû.



## Wateyên Peyvan

**Satê:** Gundekî girêdayî navçeya Geverê
**Celal:** Cubarên biharê
**Lehî:**Herikîna ava zêde
**Qafo:**Qapo, gelaşên li ber lehiyê ku cihekî kom dibin
**Awaz:** Dengê xwe, awayê gotina xweş

## Em Têbigihin

1- Dîlanê li keviya celalî çi dikir?
2- Ji beriya ku lehî bê, guhertineke çawa li derdorê çêbû?
3- Dîlana ku li ber pêlên avê ketî, hêza xwe kengê û çawa komî ser hev kir?

## Destûrên Ziman

Hevokên jêr, li lênûsa xwe binivîsin.
-Destê xwe dirêjî darê kir.
-Gurîna esman ji dûr dihat.
Di van hevokan de peyvên kar û bizavê didin diyarkirin kîjan in? Peyva ku em jê re dibêjîn **kar** di ku dera hevokê de cih digire?

## HÎNDARÎ

Bûyereke lehiyê an jî şewatê şîrove bikin.



## XWENDIN

*Xwendin nebe kes naçe pêş,*
*Peyda dibin pir derd û êş,*
*Her dem dibin destê neyar,*
*Em dê bidin xukî û bêş.*

*Her çi nexwendî rêncber e,*
*Yê ku bixwîne rêber e,*
*Her dem di nav xan û sera,*
*Serkare, ew ya serwer e.*

*Xwendin divê hem pir xebat,*
*Bo miletê Kurd û welat,*
*Kurdno ji xew rabin hemû,*
*Mizgîn li we roja me hat*

*Cegerxwîn*



## Wateyên Peyvan

**Xwikî:** Bac,qemçûr
**Bêş:** Diravên serane ji gel tê stendin
**Xan:** Avahî, mal
**Serwer:** Rêber
**Tac:**Kumê serê qiral û qiralîçeyan

## ALÎKARÊ COTKAR

Rojek ji rojên biharê bû. Di mêrgê de, hesp, ker, ga, çêlek û mî diçêriyan. Di navberekê de hemû hatin rex hev. Dihat zanîn ku giyayê vê mêrgê hêj ter û şîn bû. Hesp, beriya hemû lawiran mafê axaftinê di xwe de didît. Şihiya û got:

- Yê ku jin, zilam û zarokan li ser pişta xwe digerîne, dibe bazarê û tîne, ma ne ez im? Dema ku karek lezgînî çêdibe ma min nabezînin?

Li ser wan gotinan heya ji kerê hat ziriya û got:

-Di vê derê de jî serdestî? Her roj li ser rêya di navbera gov û bazarê de temenê min tê mezaxtin. Ji malê re çi bê kirîn ez dikişînim. Birayê hesp! Ev jî ne bes e, car caran ceh û xwarina te jî bi min didin kişandin. Tu raweste, destpêkê ez vî giyayî tam bikim. Maf ê min e.

Ga, wekî ku bibêje çênabe, serê xwe yê mezin rakir û oriya:

- Dema ez hebim, dora xwarinê nabe ya we? Aboriya jin, zilam û zarokan li ser min e. Eger ez di zeviyan de nîr û haletê nekişînim; genim, ceh û zerzewat wê bê çandin? Ji ber vê çendê ez dibêjim xwarina vî giyayî mafê min e.

Çêlekê, bi çavên xwe yên mezin, tewş li hemûyan mêze kir. Ji devê wê gilêza weke benikê têran diket û got:

-Moooo. Şîrê ku jin, zilam û zarok vedixwin, ez didim. Ma tenê şîr? Nivîşk, penîr ji şîrê min çêdikin. Pêwîst e, destpêkê ez vî giyayî bixwim.

Dîk, mirîşk, pisîk, se û mî ji piştî demekê tevlî vê goftûgoya germ bûn. Her yekê digot sûdê min ji bo cotkarî zêdetir e. Cotkar, li binê mêrgê rûniştî bû û li wan guhdarî dikir û got:



-Hûn hemû sûdên cuda cuda didin me. Ji ber vê ez we tevan xwedî dikim. Têra we tevan xwarin û cihê razanê jî heye. Hûn tev jî wekhev in.

Dilê hemû lawiran bi gotinên xwediyê xwe vehês bû û goftûgo bi dawî bû.

## Wateyên Peyvan

**Mezaxtin:** Xerçkirin
**Zerzewat:** Bêzûr, şînatî
**Têr:** Ji bo barê hêstir, ker û hespan çûwalên bi rîs hatîn çêkirin.
**Şihîn:** Hîrîna hêstir, mehîn û hespan
**Guftûgo:** Gotûbêj, (nîqaş)
**Vehestin:** (xwe rehetkirin)
**Gov:** Xan, axur

## Em Têbigihin

1- Em çawa dizanin pêwîstiya cotkar bi hemû tebayan heye?
2- Çima hesp mafê xwarinê di xwe de didît?

## Destûrên Ziman

1- Navên li jêr **taybet** in, yan jî **giştî** ne? Çima?
***Çêlek, dar, cotkar, mirîşk***

2-“**Xwarina giya mafê min e.**” Di vê hevokê de peyva “giya” navekî giştî ye. Sedema vê çi ye?

Ji ber ku gelek cureyên giya dide nasîn.

3- Di mijarê de çend bend cih digirin? Bend çawa hatine diyarkirin?

## HÎNDARÎ

1- Hûn dixwazin di bêhndana havînê de çi bikin? Ji bo hevalên xwe bêjin.

2- Demeke xwe ya xweş we borandî, bi çend hevokan binivîsin.

3- Vê çîrokê zindî bikin.

## HEZKIRINA DAYÎKÊ

Du zarokên dayîkekê hebûn. Li derdora wê rûniştibûn, bi kêf û şadî… Dema ku bi kêf û şadî li derdora dayîka xwe rûdniştin, dayîka wan hezkirina xwe nîşanî yê biçûk dida. Ji ber wê yekê zaroka din a mezin xemgîn dibû û wilo hestpê dikir ku dayîka wê ji wê hez nake. Lewra carekLewra carekê dixwaze hestên xwe bigehîne diya xwe û jê re dibêje :

- Dayîka: min adelal, tu nizanî ez çiqas ji te hez dikim. Gelo tu ewqas ji min hez dikî, an na?

- Ji bo çi qîza min, çawa ji te hez nakim?

- Ji ber ku zarokên te didu ne. Dilê te bi hezkirina du kesan lê dixe. Lê di dilê min de tenê dayîkek delal heye; ew jî tu yî û ez pir ji te hez dikim dayê.

- Dayîk: Keça minî delal, hezkirina min ji we tevan re yek e.



## Wateyên Peyvan

**Delal:**Xweşik, ciwan, spehî, rind

## Em Têbigihin

1-Çend zarokên dayîkê hene?
2-Çima zaroka mezin dihizirî ku dayîka wê ji wê kêmtir hez dike?

## Destûrên Ziman

Di hevokên jêr de kîjan peyv çawaniya dayîkê diyar dike, bibînin.

*"Dayîka delal tu nizanî ez çiqas ji te hez dikim. Ji ber ku zarokê te du ne."*

## HÎNDARÎ

1- Kesê ku yekem car hûn bibînin, pêwîst e hûn çawa xwe bidin naskirin?
2- Pêwîst e hûn kîjan pirsan jê bikin?
3- Pêwîst e hûn bersivên çawa bidin pirsan?

# KEW Û MIRÎŞK

Roviyekî daholek kir stûyê xwe, li ber kuna xwe rawestiya. Li dahola xwe xist û got: “xeberek mezin... dîlaneke giran, lîstokên mişkan, şerê kîsoyan, stranên şalolan... Rabin! Vê rasthatiya dewlemend û rengîn winda nekin, werin werin... (ding û ding... ding û ding) derbasbûna mirîşkan belaş e. Rabin... rabin!”

Kew û mirîşk li vî dengî rast hatin, kew ji mirîşkê re got: “Were, em derbasî vê dîlanê bibin, ji ber ku bê dirav e.” Gava derbas bûn, rovî got: “de werin, de werin, ez we bixwim. Hûn ketin dava min.”

Kew û mirîşkê dest bi girî kirin û li ber rovî geriyan, gotin: “apê rovî de li me bibore!”

Rovî: “Îro xem nake, taştê û şîva min heye, ez ê sibê we bixwim.” Rovî kevirek danî ber kuna xwe û çû gerê.

Kew û mirîşkê bi nikilên xwe kevir gêr kirin, derketin û reviyan. Wê carê mirîşkê ji kewê re got: “Êdî em nayên xapandin.” Her yekê berê xwe da lîsê xwe.



## Wateyên Peyvan

**Dewlemend:**Zengîn
**Lîs:** Lûs, cihê kew û mirîşkan

## Em Têbigihin

1- Kew û mirîşk ji ber çi derbasî dîlanê dibin?
2- Rovî çima kew û mirîşkê naxwe?
3- Kew û mirîşk çawa ji destê rovî rizgar bûn?



## TEST 5




**1- Vê benda li jêr bixwîne û li gorî wê pirsan bibersivîne?**

"Mirovên bi tendurist, xwedî hêz û daxwaz in. Asayî dihizirin û dixebitin. Mercê bextiyariyê ya herî girîng, bedenekî tendurist e. Ji ber vê jî destûra bingehîn hêsanî tîmarbûn e, duyem li gorî pêwîstiya laş razan e, sêyem li ser paqijiyê baldarbûyîn e, ya çarem jî werzîşkirin e."


1- Mirovên bi tendurist, xwedî çi taybetmendiyan ne?

2- Nexşeya têgehan li gorî bendê temam bikin.




**2- ji hevokên rast re tîpa (R), ji yên şaş re tîpa (Ş) binivîsin?**

- Hêmaya hevoka pirsê ev e (!). (   )
- Wateya peyva dewlemend, zengîne. (   )
- Çêlek, dar, mirîşk ji navên giştîne. (   )


KURDISTAN
Rusya
Gurcistan
Ermenistan
Azerbeycan
Caspian Sea
Gola Hezar
Iran
Iraq
Surye
Turkiye
Deryaya Reş
Deryaya Sipî
Erdexan
Qers
Agirî
Bayazîd
Maku
Erzorom
Mûş
Wan
Bidlîs
Sêrt
Çolemerg
Urmiyê
Şirnax
Duhok
Mûsil
Mehabad
Seqiz
Hewlêr
Kerkûk
Silêmanî
Sine
Qesrî Şirîn
Kirmaşan
Mendelî
Îlam
Erzingan
Dersîm
Çewlîk
Xarpût
Amed
Elih
Mêrdîn
Qamişlo
Meletî
Semsûr
Riha
Hesekê
Sêwas
Dîlok
Mereş
Efrîn
Km.
Miles
0
100
150
0
50
100